

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 54 | 2012



MIZGÎNÎ BO ZAROKAN!

Kitêbeka nû bi herdu dialektên kurdî; kirmancî û kurmancî di wê payîzê de derdikeve.


Kirmancî

Semedo ke Findo her serê sibayî saete çar de cile ser o xo hol keno û ey hîşyar keno Dat Mendo ney ra eciz beno. O vano eke Findo xoholkerdişê serê sibayî néterikno ganî cîya bibo. Findo nê fîkrê Dat Mendoyî rast veyneno. O wext o çend biwazo hende şîyêno xo hol biko. Labelê tena mendiş rasta zî weş o gelo? Eke merdim luyan zî bifikirîyo beno ke tikê xeter bo zî...

ISBN: 978-91-86139-64-3

Sven Nordqvist

Findo Cîya Beno



a
arabia

Kurmancî

Ji ber ku Findo li saet çarê sibehan hertim xwe hildavêje û wî ji xewê şiyar dike Mam Mendo êdî diweste. Ew dibêje, ku Findo dev ji hilavêtina xwe bernede, ew ê bikin ku textê wî yê razanê ji hundir derxîn.


Û li gor Findo ev hizireke baş e. Wê gavê heta ku bixwaze ew ê xwe hilbavêje. Lê ma bi rastî jî mayîna bi tena serê xwe tiştekî xweş e?

Dibe ku ji ber hatina roviyan xeteriya xwe jî hebe...

ISBN: 978-91-86139-63-6

Sven Nordqvist

Findo cihê dibe



a
arabia



Dr Nebî Kesen

(1963-11-09-2012)

**Hevkarê me yê hêja, welatparêz û dilsoz Dr. Nebî Kesen
di 11ê ilonê çû ser dilovaniya xwe!**

Bila serê malbat, dost û hevalên wî sax be!

Redaksiyona Birnebûnê

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utgas av Apec Förlag AB
hejmar 54 | 2012

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma redaksyonê
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdogan, M. Bayrak, İ. Türkmen,
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran,
Mem Xelikan, Mustafa Mih, Özgür Kara û Yusuf Polat

Adress: Navîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post: info@birnebun.com
Internet: www.birnebun.com

Tekili/İlişki
Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Dağıtım
Evrupa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı—Ankara
Tfn: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Bîha/Fiyati: Europa: 5Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swed: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatêñ din ên Ewropayê: 50Euro

Isveç hesap numarası: (Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Jî bo aboneyen li derveyî Swêdê / Isveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot—Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı: Apec—Tryck AB



1953- Mistefayê Mirê(yê bi fotê) apê Levent Kanat e. Di sala 1959an de miriye. Ev wêne li zozana Malê Mirê (gundê Bildux) hatîye kişandin. Yen serî pez girtine; Hana Malê Palo û Rehma Mistefê (jî arşîva L. Kanat)

Wêneya li ser bergê: Laokoon

Dîndarê bajarê Troyayê ye. Li gor destana Homeros a
İlyadin û Odesiyus Laokoon giregirên bajarê Troya ji bo
listikên Odesiyus ku hespekî darinî tije esker kiribû îkaz
dike. Lê ew guh nadin ser Laokoon.
Ji bo ku lîstîka Odesiyus aşkere nebe Xwendayê deryayê,
Poseidon ji deryayê du marêñ gir wek ejderha dişine ser
Laokoon û herdu lawên wî. Mar hersîyan jî dikujin.
Troyî şer li hemberî Spartiyan wenda dikin.

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re têñ, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayêñ vegeandîn.

Waqfa Kûrdân Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştigirên kovarê ne.

Naverok/İçindekiler

6	32
Ji Bîrnebûnê Ali Çiftçi	Agir, koz û okyanus ... Seyfi Doğan
7	34
Mirin Mem Xelikan	Li terîla havînê berehevkirina şoran Nuh Ateş
8	38
Nebî, tu bêxatirxwestinê ji nav me çûyî... Ali Çiftçi	Kurdê Dersimê ku nefî hatiye Konyayê re hevpeyvînek Îbrahîm Korkmaz
10	41
Çima veng zû, Nebîyo! Nuhê Hecî Malê Herşid (Nuh Ateş)	Çend pevv Mem Xelikan
12	44
Dr. Nebî Kesen Prof. Dr. İlhan Kızılhan	Bavol Ez jî têm... Nesrin Bayram
13	46
Mirina Nebî Kesenî, em xemgîn kirin... Îbrahîm Güçlü	Qurban Mem Xelikan
14	47
Nebî Kesen bi nivîsên xwe yên li ser Kurdên Almanyayê dihat nasîn Zekî Ozmen	Hezar, du hezar, sê hezar Îhsan Turkmen
16	52
Nebi Kesen Hamburg'da toprağa verildi Mehmet Atak	Xewn Seyfi Doğan
20	54
Ey Güzel İnsan! Birayê min û delal! Zübeyde Kesen	Cara yekemîn ez li Kurdistanê bûm Muzaffer Ö zgür
21	59
Diyaspora Ewropa û kurdên Anatoliyê Dr. Nebî Kesen	Piştî 600 salan Şêxbizêniyên bakûr û başûrê Kurdistanê bi hev şâ dibin Hemin Xoşnaw
27	63
Dersa kurdî ya hilbijartî, Malhuleke Sîyasî Nuh Ateş	Tayek Por Rohat Mîran
30	66
Awirê Efsûnî Xizan Şîlan	Resam Nuh Ateş ile söyleşi Filiz Ateş
68	
Kürtlerin en eski tiyatro eseri, Ecel-i Kaza Sedat Ulugana	

Ji bîrnebûnê

Hukumeta AKPê, di bin serokatiya Recep Tayyip Erdoğan de bû deh sal, bi gavek pêş û du gav paş de, bi siyaseteka derevîn, nîjadperest, şovenîst û bi karanîna ol xelkê me heta roja îro xapand!

Erdoğan digot; *li Tirkîyê doza gelê kurd heye û ew problem ya min e ji. Em ê ji vê re çareserîyan bibînin!*

Lê, hê jî tu çareseriyeke berbiçav nehatiye kirin. Ev dîtina fermî ya nîjadperest a rejîma Tirkîyê, ya kemalist û şovenîst ku hîn jî nasnâma kurd, cografya Kurdistanê bi lêv nake, li ba wan wek xetên sor in.

Partiya Erdoğan di vê kongra dawî de jî ev programa xwe ya nîjadperest pir vekirî, aşkera kir. Ji ber politîka wan a nîjadperest û şovenîst ev şerê li welêt jî her berdevam e.

Li bajarêñ kurda dîsan atmosfera wek 12 îlona 1980î rûdaye û bi hezaran siyasetmedar û cîvanêñ kurd hatine girtin. Wek berê dîsan siyasetêñ xwe yêñ kewn li hember kurdan dimeşînin. Armanca wan; kurda berahev bidin ku tu mafêñ kurda fermî neyêñ naskirin. Bi nukirina perwerdeyê, zarokêñ kurda,

hê di temenêñ çar-pênc saliyê de asîmîle bikin û yêñ ku li ber xwe di-din jî bi kuştinê tehdît bikin.

Lê, kurd êdî ne ev kurdê berê ye! Dema birayêñ xwe yêñ li başûrê welêt bi serxwebûnî dijîn, bi çand, ziman û kesayetiya xwe serbilind dibin, yêñ bakur jî hêdî nema kesayetiya xwe înkâr bikin û wek însanê bindset, li ser axa welatê xwe, di wê dema internetê de, koletiyê qebul bikin.

Cîvanêñ kurd, ci li welet û ci jî li derveyî welêt be, di warê nasname û mafê xwe yê netewî de bûne xwedî zanistîyen berfireh!

Bi vê politîkayê, li welêt ev pirsa nayê careser kirin. Lazim e ji her aliyê civatê ve deng li hember politîkayêñ wiha yêñ nîjadperest, bilind bibin!

* * *

Mîxabin, me hevkar, dost û hevalekî xwe yî hêja, **Dr. Nebî Kesen** di 11ê îlonê de wenda kir. Loma me di vê hejmarê de piranî cîh da nivisêñ li ser Nebî û mirina wî.

Bimînin di xêr û xweşiyê de!

Ali Çiftci



Mirin

Dayîka te xwe bipesine

Tu anî yî dinê

Çi har û bi hov î

Bû yî dawiya jîyanê

Qet şa nebe

Te Nebî ji me veneqetand

Ew bi rûkenî û delalî ya xwe

Di sîng û dilê me de dijî

Bizane, qet ji te netirsî

Ji bo azadî û serxwebûna welêt

Çend sal in te di bin

Çengê xwe de digerîne

Erê çûyîna vî pirr zû bû

Lê tu nizanî

Lezgînîya vî

Mizgîna KURDÎSTANA Rojava

Bi Cegerxwîn gîne

Mem Xelikan - 2012

Nebî, tu bêxatirxwestinê ji nav me çûyî...

Xeberên reş zû belav dibin. 12ê ilonê, berbi nîvro, li kar, li ber komputerê weke her carê min xeber dixwendin. Navê Nebî ji hebû, lê weke ku qet vî navî nebînim, ber bi jêr va min xeberên din xwendin. Di vê navberê de Yusuf Özden telefon kir û got: xeberekê ne xweş heye, nizanim we bihîst an na? Mixabin dema behsa xeberê nexweş tê kirin, li xeribîyê yekcar mirin an qezayek li welêt tê ber çavê meriv! Meriv dibê de îcar kî miriye! Hîn ku ez neketim nav şika, Yusuf navê Nebî Kesen hilda, min yek car got: na lo, Nebî! Çima! Min hê doh an pêrê dûrûdirêj bi saetan pê re deng kir! Tu tiştekî wî tune bu! Ma xebereka çewt nebe! Got: nizanim, dibên ANFê nivisiye... Min hêdî nikaribû bi Yusuf re deng bikim... Min got ez ê dûra telefona te bikim... Yekcar dîsan vegeŕim ser malpera ANFê û ji nû ve dest bixwendina xebra kir... Mixabim ev xeberê nexweş yekcar derket ber çavê min. Min nizanibûm ci bikim!... wek caran yekcar min telefona xwe girt û ji Nebî re telefon kir. Telefona Nebî her weke normal, lêdiket û ez bi hêviya ku ev dê niha bersiva min bide û ez ê ji ev xemgîniya xwe xilas bibim, benda bersiva wî bûm. Bi deqîqeyan telefon lêket û ber-

siv nebû! Ji oda xwe derketim, mîna ku tiştek li ber min winda bibe, ji odekê çûm oda din û nikaribûm li ciyê xwe rûnim. Mêvanên min ji hebûn, min hew ew jîbir kiri bûn û ji nû ve çûm oda xwe dest avet telefonê, ji Muzaffer re telefon kir ka bizanibim ma ew tiştekî dizanin an na? Muzaffer yekcar bersiva min da, lê bi dengê Muzaffer re dilê min kelkelî û deng ji min derneket!

Qîrê qîra Muzaffer bû, digot: lo cer bû, bo ci tu deng nakî? Muzaffer ev gotinên xwe çend caran li ser hev pirsîn, mixabim min qet nikaribûm bersiva wî bidim, piştî demekê min tenê karibûm bêjim: "Me hevalê Nebî Kesen wenda kir..."

Xuya bu xeberê wan ji tune bû! Ez gelek berketim ku ev xeberê reş ê heval û dostê xwe yê hêja bi xwe ji hevalên din re bidim!

Erê, hêdî ev rastiyek bû divê min qebûl bikira!... Saetek derbas nebû hêdî telefona min germ bû!.. Heval, nas, dost û kurdên me yên Anatoliyê telefon li ser telefona kirin. Hemû şok bibûn! Ma çima Nebî! Di temenekî ciwaniyê de! Ew mirina wî bi herkesî qar dihat!

Wê êvarê min nikaribûm li mala xwe rûnim, min telefona Amed Tigrîs

kir, xwest vê xemgêniya xwe bi heval û dostê hêja re derbas bikim. Rabûm ji hevalekê ra telefon kir û em bi hev re çûn mala Amed Tigrîs! Kêfa Mamoste hat ku em li wir bûn, lê demek dirêj nejot, Mamoste ji min fêhm kir ku tiştekê nexwes qevimîye!

Dema min mirina Nebî jê ra got, ew jî gelek ber ket û yekcar got: "Ma kesekî din tune bu!.."

Erê, bersiveke li gorî min pir di cih de bû! Ma însanevê hevqas enerjîk, aktîv û têgihiştî û berhemdar, ma diva bû, di temenekî wiha ciwan de, ji nav me bar bike û here?

Hezar carî mixabin, mirin pir qeles û sar e! Xeber nade û nebêje va ye ez têm, da ku em xatir ji hev bixwazin!.. Mirina di temenekî ciwan de herdem meriya pir diêşîne! Gelek nas, dost merivê nêzî meriv; bav, dê, bira, xwuşk, ap, xal û xwarziyên meriv dimirin, giştik ji ji bo herkesî windayiyeka mezin e!

Lê mirina hinek însanan ne tenê bo dost, nas û meriyên xwe, herwiha ji bo hemû gelê xwe wendayiyek e! Erê, Nebî Kesen jî yek ji wan kesan bû ku ji bo me giştika, windayiyeke pir mezin bû! Nebî, însanevê, berê her tiştî, dilpak, durust, zana, têgihiştî, kurdperwer û humanist bû! Bo wê yekê jî mirina wî bo gelê kurd bi tevayî wendabû-neke mezin bû!

Ba me kurdan gotinek heye ku pira-

niya me bihîstine, dibêñ; "Mirî bi qimet dibin!"

Rast e, mirî bi qimet dibin û zû jî têñ jibîr kirin! Lê merivê wek Nebî Kesen bi rastî, bi hewildan û berhemên xwe her li ber çava nin, ji bo wê jî dê Nebî zû bi zû neyê ji bîr kirin, ew dê herdem, bi dîtin û kesatiya xwe baş û pak di hiş û bîranînê me de bijî û her li ber dilê me be!

Nebî, herdem kurdistanî difikirî û ji bo nasname û maşê gelê xwe herroj difikir û xebatan de aktîv bû. Me wek kovara Bîrnebûnê nivîskar, hevkar û dostekî qedirbilind û gelê kurd jî ewladekî xwe yê hêja û dilsoz wenda kir!

Li vir ji malbata Nebî; ji destpêkê de, dê û bav, bira û xwuşk, kurê wî û hevji-na vî ra dibêm; serê we sax be û Yezdanê mezin û dilovan sebreke bide we!

Bila serê gelê kurd û hevkareñ Bîrnebûnê û yê me heval û nasêñ Nebî hemûyan sax be!

Nebî, tu bêxatirxwestinê ji nav me çûyî, lê em baş pêdizanin ku dil û daxwaza te her bi me ra bû. Û ev daxwaz û hêviyên te ku li gelê kurd di ware nasnama kurd de dê her bêñ bi cih kirin. Mixabin em ê bi hev re nebînin, lê weke te jî hertim digot; ev rojana ne dûr in, her ku diçe nêzîk dibin. Hevalê hêja bila çavêñ te li paş te nemîne û rehet raze!

Ali Çiftci

Çima veng zû, Nebîyo!

Nuhê Heccî Malê Herxîd (Nuh Ates)

Nebîyo, miriniya te ya ji nişkava ez jî teve, dost û yarêن te matmayî û di nav êş û xeman da hîştin. Em ê ji xwe bi xwe dipirsine û diwêne, çima veng zû, Nebîyo!

Mêrê çê, ronakbir û zanayê komma kurdên Anatoliyê, xebatkarê doz û daxwazê kurd û Kurdistanê, heweskar û nivîskarê kovara Birnebûnê ji nav heval û yarêن xwe bar kir çû.

Kwîr bibê ha, miriniyê jî xwe şas kiriye, bayê wê li Nebî qelîfî û ew helna bir dîyarê miriyan.

Erê, mirinî qeder e, barkirineke bêveger e û rûyekî jîyanêyi sik û sar e. Lê miriniya zû, berwext pir bi qahr e.

Miriniya te dihatî bîra kê, Nebîyo! Hîn du û sê hefta di ber vê min ji te ra li têl xist. Me qedera seetekê deng kir, li ser haziriya hejmara Birnebûnê ya li ber çapê jî. Mîna ku tevên, tû î xwaş û hal, şen û şâ wûyî.

Xopana krîza dil jiyan li te herimand. Ci dunyeke derewin û neheq e lo, mezinê me wer digotin.

Pênc mehan di ber vê jî ez li Hamburgê bûm mîvanê tê û xanima te ya kubar û mîvanperwer, Irmîyê.

Min lawê tê yê şîrîn, Serko jî dit û gavekê me bi hev ra sohbet kir. Tu vê derd û kul û ji heyata xwe razî xay dikirî. Evarê ez, tu û Husêن Duzen û em çûn li nava bajarê Hamburgê gerriyan hetanî devdeve siwê. Te cixare cihhîstiwyû û rind li siheta xwe mês dikir. Ma kriza dil dihata bîra kê.

Dûv ra Tu û ez çûn Kopenhagê te-ve şenahîya komeleya Încowê bûn û çend roja li wir man. Me li wir wexteke rind bi hev ra û bi dost yarêni li wir va derbas kir. Li wir jî tu yî li ser xwe bûyî û kêfê te li şûnê bû.

Li vegeînê, bi rê da, te bi heyecanekê qala projeyeke ji bo Birnebûnê dikir. Te dixwast ku em li ser kurdên Anatoliyayê yên li wela-têن Ewropa dosya amede bikin û di Birnebûnê da biweşînin... Mala minê, heyfa Nebî!

Xopanê ji nişkava bi pîst girt û ew ji nav me kaşkir, ji ebedîyê ra bir. Jiyanekê ku li Încowê, li nava Anatoliyayê 50 salî di ber vê destpe-kirî bi derbeyek ji dil da bi dawî bû.

Nebî li Încowê xwedê da û mezin bû. Li wir çû mektewe û lisê teve kir. Li Încowê di telebetîya xwe da dest-

pê karê şoreşgeriyê kir. Li yanê gruba Rîya Azadî ji bo sosyalîzmê û azadîya miletê kurd kete nav kar û xebatan.

Li pişt derbeya eskeriyê, ew jî mîna bi hezaran kurdên din kete rîya xerîbiyê û hate Almanyayê. Li wir jî, li rû xwendin û karê dewarkirinê ew di nav refîn KOMKARê da te-ve kar û xebata sewa azadiya milete kurd û heq û azadîyên koçberan bû û bi salan ked da. Wextek hat wî yan guherî, lê kar û xebata wî dane-westî, di NAWenda Kurdî, Özgür Politika û Roj TV da kar û xebata siyasî û niviskarî dewam kir. Di xebat û danûstandinên xwe da neyartî nekir û dest ji çavkirina dilûxatiran û tîfaqa kurdan berneda.

Di karê xwendinê da jî tu jîrek û serkevtî bûyî û doktora aboriyê te bi dest xist.

Tê Bira min, wexta ku kovara Birnebûn nû derket te di serî da te sar lê mês kir û nexwast nêzikî wê bibî. Çend cara min teklif kir ku tu di Birnebûnê da binivisi, lê nebû. Dîsa jî hevaltiya me dewam kir.

Rojek hat tu nêzikî Birnebûnê bûyî û bi ya min te dest bi şoreşekî nû, pîroz û giranbiha kir. Te di Birnebûnê da dest bi nivîsandina

kurdî kir, bi zimanê xwe yê zikmâkî û li ber cankêşiyê.. Mala te hezar carî ava!

Oxir be birako, çûyîna xêrê be. Tu ê li dunye wî alî ne bi tene bî. Tê herî ba giregirên kurda yên çêtir û mîrx-as. Tê herî dîwana Hemedanî, Xerînî, Cizirî, Xanî, Şerefîyan Bedlîsî, Kadî Mihemed, Mistefa Barzanî, Mîr celledet Bedirxan Cigerxwîn, Osman Sebrî, Şêx Seid, Seyîd Riza, Alî Şêr... Tê herî ba hemgundî û rêhevalê xwe, Yilmaz Demir, şehîdê berxwedana zindana Amedê û ba bi sed-hezaran canfedeyên din yên deweya kurd û Kurdistanê. Bi vekîlî silavan be û mîzgînê bide wan û bibê miletê we/me nêzikî azadîyê bûyê, parçêkî Kurdistanê azad e, yek jî ha îro ha si-wê. Û bide ser û bibê, mixabin li her sê parçeyên welêt hîn şer û şewat, zilm û neheqî heye û berxwedan dewam dike û hîn kurd bitûn û baş li gorê şîretên Xanî û Kadî Mihemed yên li ser tîfaqê tevnagerine.

Nebîyo ne tu û ne ked, kêrî û fede-kariya te ya bi salan ji bîrnabin!

Serê malbata te û me sax be!

Mainz, 13.09.2012

Dr. Nebî Kesen

Prof. Dr. İlhan Kızılhan

Lo lo kuro, birayo, kurdo, Nebîyo, ci xêr e, tu hevqas zû ji me qetîya yî?

Hevqas ribet e silav ji me dixwazî û diçî?

Dê çi bibe ji wan planêن Te li ser Kurd û Kurdistanê?

Lo kuro, birayo, kurdo, Nebîyo çima hevqas zû çûyî li ser dilovaniya xwe?

Ez jî bibêjim li ser mirovekî ku welatparêz, dilovan, tekoşer, nivîskar, lêkolinvan, politikzan û beriya hertiştî dost û heval?

Jî zarokatiya xwe heta dawîya jîyana xwe ketibû li ser rê û lêgerîn ji bo azadîya milletê xwe Di ciwantiya xwe de bi rêxistin, radikal, şoreşvan, li dervayî welat xwendevan, xerîb, têgihştî û herdem bi hêviya yekitiya Kurdan....

Lo lo kuro, birayo, kurdo, Nebîyo ma tu hinekî li hêviya me rawestiyayî ne dibû?

Bi bê bawer û hestir, bi hers û xemgînî, naxwazin çûyina te qebul bikin. Dê ci bibe ji xewnêن me li ser azadîya welatê me.

Ka, emê bi hev re gav bi gav di nav erda bav û kalan de biggerîyan? Ka, em biçûna li ser çiyayên herî bilind, meyê cixareyek bikişandina û biketina nav fikir û ramanan?

Ka, me yê ji bo Kurdên li Ewropa lêkolîn çêbikirina? Ka, me yê li dinyayê millete xwe bi başî û serbilindî bidana nasîn, daku ev millet jî wek her milletekî bi şeref û rêz,bihatina pejirandin?

Lo lo kuro, birayo, kurdo, Nebîyo çima te îro ev roj wiha tarî kir?

Çiqas li ser te dînîvinim, hevqas zehmetir ji min re tê rastiyê qebul bikin.

Nikarim hinek gotin û bêjeyan li hev

bihûnim. Ev du seat in bêja mirin difikirin, lê ditirsim binivsînim...

Dr. Nebî Kesen di temenekî ciwan de cû ser dilovaniya xwe. Dr. Nebî Kesen mirovekî jîr, zana û herdem hewl dida ku yekitiya Kurdan çêbibe, daku milletê wî jî bigihijê mafê xwe.

Dr. Nebî Kesen ji Anatoliya Navîn ji dayîkbûna xwe ve dît ku milletî wî çawa di nav êriş, koteke û metingeriyê de dijî. Belkî lewra jî, Nebî hevwas û bawerî kurditîya xwe bi çand û ziman, bi politik û lêkolinan di nav gelê xwe de diparast. Herdem bi herkesî re ne yek fikir bû, dostêن kevn „xeyidî“ bûn, lê Nebî riya xwe ji wan qut nedikir. Bi dostêن nû re jî ji bo mafê kurdan her dem ne yek fikir bû. Herdem dixwest dostêن „kevn û nû“ li gel hev rûnêن, daku tekoşîna Kurdan mezintir bibe.

Dr. Nebî Kesen bi her derfetên xwe, quwet û hêza xwe, bi dil, heste û evîna xwe mirovekî hêja yê nifşa Kudistanî û Ewropî bû. Bi çûyina wî walebûneke mezin çêbû.

Birayê delal, Nebîyê me, riya te vekirî û ronî be. Ez naxwazim, lê divê werim dawiyê, ev çiqas zehmete lo!

Bila serê malbat û gelê te sax be!

Mirina Nebî Kesenî, em xemgîn kîrin...

İbrahim Güçlü

Miletê kurd, beriya vê pênc rojan (11 ilona 1980yî di saet 22.00-an de), birayê hêja û kurdperwerê dilsoz û rewşenbirê hevdem/demokrat bispor Nebî Kesenî li Elmanyayê li bajarê Hamburgê wenda kir.

Mirina Nebî Kesenî, li Ewrupayê û li Tirkiyeyê û li Kurdistanê her kurdek xemgîn kir û êsand. Bi taybetî jî kurdên li Ewrupayê gelek xemgîn bûn, lewra Nebî Kesenî 32 sal in ku li Ewrupayê ji kurdan re xizmet û alîkarî dike.

Nebî Kesenî, di sala 1963-an de li Bajarê Konyayê bajerok a Canbegê hatibû dînyayê. Ew jî wek her kurdekî Anatoliya Navîn bi hesreta welatê xwe Kurdistanê mezin bû.

Wî dema ku dest bi xwendinê kir, rastiya xwe nas kir: Nasnameya xwe, malbata xwe, eşireta xwe, kurd û tirk nas kîrin. Wî jî fahm kir ku ew ne ji Canbegê ye. Ew jî li Canbegê biyanî ye û ji ciyekî gelek dûr hatîye li Canbegê cîwar buye.

Wîzanî ku ew ji malbetek ku ji Kurdistanê hatî ye.

Dema dibistana destpêkê û navîn û lîse xwend, nasnameya xwe baştur nas kir; di wî de şûûra kurdîtî çê bû.

Ew di zanîngehê de besdarî tevgera Kurdistanê Rêye Azadî bû. Ew bû endamekî Komeleyên Çandî ya Gel a Şoresger (DHKDê). Wî heta dawiya 1980-yî di DHKDê xebatêna xwe yên kurdîtî dom kir. Dema di DHKDê de xebat kir jî, kesekî ge-

lek zîrek bû.

Ew jî wek gelek kurdên Bakûrê Kurdistanê piştî darbeya leşkerî ya faşîst ya 1980yî derket derveyî welêt û çû li Elmanyayê cîwar bû. Li Elmanyayê karûxebatêna xwe yên kurperwerî gelek bi disiplin meşand. Demek dirêj ji KOMKARê re berpirsiyarî kir.

32 sal in ku li Elmanyayê dîjî.

Min ew li Ewrupayê jî nêzikî de nas kir. Nêzikbûna min û wî, ji du faktoran dihat. *Faktora yekemîn*, ew jî wek min kurdekî Anatoliya Navîn bû. Wî digot ku "kurdperweriya min de rola we heye." *Faktora duyemîn*: Ew jî piiştgirekî Yekîtiya Ewrupayê bû. Li ser yekîtiya Ewrupayê lêkolîn û pirtukên wî çap bibûn. *Di heman dem de ji bibû kesekî liberal û ji komunîzma stalînist dûr ketibû...*

Nebî Kesenî, pisporê ixtîsada/aboriya navneteweyî bû. Wî heta dawiya jîyana xwe jî li Hamburgê karê muhasebe meşand.

Ew kesekî gelek berhmdar bû. Wî gelek pirtûk û meqela nivîsandine.

Mirina wî, wek her kurdekî ez jî gelek xemgîn kîrim.

Bêwext mirina wî ji bona miletê kurd, doza miletê kurd û demokrasiyê kîmasî-yek mezin e.

Ez ji bona malbata wî, hevalên wî, miletê kurd ser saxî dixwazim.

Amed, 15. 09. 2012



Nebî Kesen bi nivîsên xwe yên li ser Kurdên Almanyayê dihat nasîn

Zekî Ozmen

Mirina aborînas û nivîskarê kurd Dr. Nebî kesen kurdên li Almanyayê dijîn kir di na-va xemgîniyê de. Nebî Kesen ku ji kurdên Anatolyaya Navîn e û di sala 1963an de li Cihanbeyliya girêdayî Konyayê hatibû dînyayê, piştî darbeya leşkerîya 11ê ilona 1980an ji ber sedemên siyâsî ji Tirkiyeyê koç kir.

Nebî Kesen şevtira din piştî qiryana dil pê ket, birin nexwêşxaneyê û li wir jiyanâ xwe ji dest da. Di vê navberê de hevji-na Nebî Kesne, Irmgard Schaefer-Kesen û kurê wî Serko Schlichting bi rêya e-mailê hem mirina wî ragihandin û hem jî tika kirin ku ji ber xemgîniya ew tê de ne tikes niha bi telefonê li wan negere. Hêjâyî go-tinîye ku Nebî kesen yek kêm ji nivîskarê kurd e ku bi taybetî di nivîsên xwe de cih dida pirsgirêkên kurdên li Almanyayê dijîn û di nava hewldana nêzîkirana saziyên kurdan ên li vî welatî de bû.

Yekîtiya saziyên kurdên Almanyayê daxwaza wî bû

Herî dawî di hejmara 41. a rojnameya Rûdawê ya çapa Ewropayê de Nebî Kesen di derbarê hevkariya saziyên kur-

dan ên li Almanyayê de wiha axîf bû: “Hevkariya YEK-KOM û KOMAKARê wê roleke pozitif li ser kurdên Almanya bilize. Mimkûne ku li ser van rêxistinan û bi saziyên din re û bi piştgiriya kurdên li der rêxistinan li Almanya rêxistinek hemû kurdên li Almanya bê avakirin. Bo daxwazên kurdan rêxistinek wek Konseya Navend ya Yahudiyan (*Zentralrat der Juden*) yan jî Cîvata Tirk li Almanya (*Türkische Gemeinde in Deutschland*) pêwist e.

Bi hezaran kurdên li Almanya endamê YEK-KOM yan jî KOMKARê ne. Eger ev federasyon bi hev re kar pêk bînin, kurdên li der wan jî wê piştgiriya vê yekê bikin. Bi vî awayî rêxistinek bo civata kurd li Almanya mimkûn e. Wê demê jî sîyaset û idareya Almanya wê bizanibin ku civata kurd li Almanya xwedî rêxistinek e di nava yekîtiyê de ye. Bandora koçberê kurd li ser hikûmetan û partîyan bi rêxistinek wisa mezin wê pirtir be. Belavbûna rêxistin û şexsîyetên kurd yek sedeme ku mîlyonek koçberê kurd li Almanya hîn bi fermî nayêq qebûl kirin.”

Çavkanî; Rûdaw

HAMBURG – Ekonomist ve yazar Dr. Nebi Kesen Almanya'nın Hamburg kentinde kalp krizi sonucu yaşamını yitirdi. Almanya'nın Hamburg kentinde mali müşavirlik yapan Dr. Nebi Kesen, dün akşam geçirdiği kalp krizi sonucu yaşamını yitirdi.

Kesen saat 22:00 sıralarında aniden fenalaştı. ambulansla St. Georg Hastanesi'ne kaldırılan Kesen, yapılan tıbbi müdahalelere rağmen kurtarılamadı.

Evi ve bir çocuk babası Kesen 20 Mart 1963'te Konya'nın Cihanbeyli İlçesi'nde dünyaya geldi.

Siyasi nedenlerden dolayı, 11 Eylül 1980'de yurdisına çıkan Nebi Kesen, sürgünde gelişinden tam 32 yıl sonra yaşama gözlerini yumdu. Uzun süre Özgür Politika gazetesinde köşe yazarlığı yapan Nebi Kesen son olarak geçtiğimiz hafta Almanya'nın Mannheim kentinde düzenlenen Kürt Kültür Festivali'ne katılmıştı. Kesen, Alman Federal Meclis'te 15 Ekim günü görüşülecek "Kürt kimliği tanınsın" kampanyasına imza veren kişiler arasındaydı.

Doktorasını Avrupa Birliği üzerine yapan Kesen'in Avrupa Birliği ve Kürtlerle ilgili kitapları, göçmen politikasıyla ilgili çok sayıda çalışması bulunuyor.

ANF

Nebi Kesen son yolculuğuna uğurlandı

ANF

17 Eylül 2012

Almanya'nın Hamburg kentinde 11 Eylül akşamı geçirdiği kalp krizi sonucu yaşama veda eden Kürt aydını ekonomist Dr. Nebi Kesen, son yolculuğuna uğurlandı.


Hamburg'taki Altona Mezarlığı'nda bugün düzenlenen cenaze törenine ailesi ve yüzlerce kişi katılarak Nebi Kesen'e karşı son görevlerini yerine getirdi. Ailesi adına bir konuşma yapan kızkardeşi Zübeyde Kesen, ağabeyinin yaşamı boyunca zulme, haksızlığa karşı çıktığını ve Kürtlerin ulusal birliği için mücadele ettiğini belirtti. Kesen'in 12 Eylül mağdurlarından olduğunu da sözlerine ekleyen Zübeyde Kesen mülteci yaşamında da olsa her zaman ulu-

sal değerlere bağlı olduğunu vurguladı. Tabutu Kurdistan bayrağıyla örtülen Nebi Kesen için bir de anı defteri açıldı. Profesör Norman Peach, Sol Parti Milletvekili Cansu Özdemir, gazeteci Cahit Mervan, Günay Aslan, Serhat Bucak, Ahmet Kahraman gibi tanınmış birçok şahsiyetin de katıldığı cenaze töreninde Nebi Kesen'in Türkiye'de yaşayan anne ve babası da hazır bulundu.

Avrupa Birliği ve göçmenler üzerine çalışmalarıyla tanınan Nebi Kesen, 11 Eylül 1980'de yurdisına çıkmıştı. Kesen darbeden tam 32 yıl sonra 11 Eylül 2012'de sürgünde yaşamını yitirdi.

Kesen ailesi taziyeleri, Hamburg'un Harburg ilçesinde Moorstr. 11 adresinde kabul edecek.

Nebi Kesen Hamburg'da toprağa verildi



11 Eylül Salı günü geçirdiği kalp krizi sonrasında kaldırıldığı Hamburg'un St. Georg hastanesinde vefat eden vergi uzmanı Dr. Nebi Kesen, Alman eşinin isteğiyle Lurup semtindeki Altona Mezarlığı'nda toprağa verildi. Aslen Konya'nın Cihanbeyli ilçesinden olup, 12 Eylül 1980 ihtilalinden önce Almanya'ya gelen Nebi Kesen(49), yerleştiği Hamburg kentinde açtığı Muhasebe bürosunda işadamlarına uzun yıllar hizmet verdi. Doktorasını ise "Avrupa Birliği" konusundaki çalışmasıyla verdi.

Mehmet Atak



CENAZE TÖRENİ KALABALIKTI

30 yıldır Hamburg'ta yaşayan Dr. Nebi Kesen'in vefatını takiben St. Georg semtindeki Şeyh Sait Camii'nde 4 günlük taziyeden sonra, cenazesi de Lurup semtinde Max-Schmeling caddesi kenarındaki "Altona Mezarlığı"nda toprağa verildi. Kesen'in Alman eşi, mezar ziyaretinin kolaylığı sebebiyle Hamburg'da toprağa verilmesini uygun bulmuştu.

Güneşli bir sonbahar günüydü...

12 Eylül'den birgün önce Türkiye'yi terkeden Nebi Kesen'in 30 yıl süren gurbetliği, oldukça genç bir yaşta ve yine Eylül ayında noktalanmıştı. Bir

çiçek bahçesini andıran mezarlıkta tabutu başında aile fertleri, yakınları, dostları, iş arkadaşları, iş dünyası ve fikir birliği yaptığı onlarca kuruluş yöneticileri ve üyeleri, Almanı, Türkü ve Kürtüyle, hafta arası olmasına rağmen yüzlerce insan toplanmıştı. Kesen'in anne ve babası da cenaze için Türkiye'den gelmişlerdi. Eşi, oğlu ve kardeşi de mezarlıktaydılar.

CENAZEYE KATILAN ŞAHISLAR ve KURULUS TEMSİLÇİLERİ

Hamburg Sol Parti Milletvekili Cansu Özdemir, Prof. İlhan Kızılhan (Kürtçe ve Almanca ko-

nuşma yaptı), Prof.Norman Peach, Avukat Serhat Bucak, Avukat Şerafettin Kaya, Ahmet Kahraman, gazeteci Cahit Mervan, Günay Aslan, Danimarka Yeni Çoballı Köyü Kültür ve Dayanışma Derneği, Komkar, Yek-Kom, Avrupa Barış Meclisi, Hevkar, Yeni Özgür Politika, Cıvaka İslamiye Kürt, Kom Civan, Mala Gelê Kürdistan, Demokratik Alevi Federasyonu, Hamburg Kürt Yazarlar ve Sanatçilar Kulübü, Hamburg Kürt ve Türkiyeliler İnisiyatifi, Dengê Agirî Sitesi, Bîrnebûn Dergisi, Hamburg Alevi Kültür Merkezi, Nawent, Batman Restaurant, Lokma Restaurant, Hamburglu işadamı Ertan Çelik, Orhan Çelik, Baki Dağdelen, Cahit Balat, Kiel'den gelen işadamı Salih Çete, Salman Mazı, Turan Özек, Avukat Hüseyin Mülüyim, Necati Gür ve Hamburg Karakocanlılar dernek başkanı Ali Haydar Oral.


YÜZÜNÜ SON DEFA GÖRDÜLER

Komkar Hamburg Başkanı Hoca Şerif Akgül'ün mutad konuştusından sonra, Kesen'in kızkardeşi

Zübeyde Kesen de ağabeyinin zulme ve haksızlıklara karşı mücadele eden bir kişiliğe sahip olduğunu belirtti. Diğer konuşmacılar da Nebi Kesen'in şahsiyeti ve fikriyatı üzerine görüşlerini açıkladılar. Konuşmalar Türkçe, Kürtçe ve Almanca olarak yapıldı. Bu meydanda topluca cenaze namazı da kılındı.. Daha sonraki bölümde ise, cenaze ilerideki bir odaya götürüldü ve son yolculuğuna çıkan Nebi Kesen'in yüzü, ailesi ve yakınlarına son defa gösterildi.

MÜZİK ve DUALARLA TOPRAĞA VERİLDİ

Bir Türk şoförün kullandığı cenaze arabası ile Nebi Kesen'in hazırlanmış mezarı başına getirilen tabut, tekbirler ve dualar arasında toprağa verileceği sırada, bir müzik sesi çevreyi kapladı. Cenaze törenine katılanlardan birinin elindeki radyo-kasette Şivan Perver'in Kürtçe "Hevalê bargiran im" adlı parçası çalıyordu. Bu Nebi Kesen'in vasiyeti idi.. "Öldüğümde beni bu türkü ile gömün" demişti. İşte normal olarak cenazelerde pek görülmeyen cinsten bu vasiyeti de yerine getirilmişti.



Avrupa kıtasının kuzeyindeki Almanya'da, anavatanından binlerce kilometre uzaklıktaki bir noktadaki bir Hristiyan Mezarlığı'nda bir Türkiyeli insan toprağa veriliyordu.. Günümüzün ünlü İlahiyat Profsörlerinden **Yaşar Nuri Öztürk**, insanların illa ki kendi ülkelerine, kendi köylerine gömülmesi diye bir kaide bulunmadığını, insanların mezarı nerede olursa olsun, yapılan duaların dünyanın her köşesine ulaşacağını her defasında açıklıyordu.

Nebi Kesen'in cenaze merasiminde hakim olan dil Kürtçe idi.. Zaman zaman Türkçe ve Almanca konuş-

malar ve açıklamalar yapıldı. Dini lisan ise, dua bölümü hariç, tüm Müslümanların kullandığı ortak dil olan Arapça idi.. Kisacısı çok genç yaşta aramızdan ayrılan **Dr. Nebi Kesen**, cenazesinde bile 4 ulusal dili bütünlüğe dayanarak, insanlar arasında dil,din,ırk ve renk farkı olmaması gerektiğini bilincine vesile olmuştu. İşte uluslararası integrasyon buydu!..

Avrupa Postası olarak **Dr. Nebi Kesen'**e Allah'tan bol rahmet, yakınlarına başsağlığı ve sabırlı günler diliyoruz.

Nur içinde yatsın !



*Yüreği insan sevgisi, barış, kardeşlik ve özgürlük için çarpan;
Ey Güzel İnsan!
Birayê min û delal!*

Seninle gurur duyuyorum.

*Sadece ailen için değil aynı zamanda binlerce sevenin için
sen örnek bir insansın.*

Elbette erkendi gidişin.

*Ama biliyorum ki kutsal bir amac yolunda yürüyenler;
Denizler gibi, Ahmetler gibi, Yılmazlar gibi,
kısacası tüm mazlumlar gibi erken veda ediyor bizlere.*

Ayrılmıyoruz.

Sadece bir yol ayırmadık.

Ayrı kollardan akan nehirler gibi er geç denizde buluşacağız.

Canım Abim,

Gözün arkada kalmasın.

*Bize emanetin olan sevgili Şerko'yu yalnız bırakmaycağıma
ve yürüdüğün özgürlük yolunda farklı alanlarda da olsa aynı
yolda yürüyeceğime söz veriyorum.*

*Böyle bir günde bizi yalnız bırakmayarak yanımızda yer alan
değerli akrabalarımıza, arkadaşlarımıza ve dostlarımıza
şahsim ve ailem adına sonsuz teşekkürlerimi sunuyorum...*

Zübeyde Kesen

Diyaspora Ewropa

û

Kurdên Anatoliyê

Dr. Nebî Kesen


Dawiya meha gulanê bi navê ``Şeva Încovê`` li Kopenhagê, paytaxta Danîmarkê, şevek çêbû. Di vê çalakîyê de mîvanên ji Tirkîyê jî hebûn. Yek ji wan Serokê Şaredariya Încovê, Îlyas Kara bû ku ew ji partiya AKPê ye. Mevanên din ê ji wetal mebûsê partiya CHPê Konya Atilla Kart û cigirê serokê giştî ya HAKPAR Fehmî Demîr bûn. Ji derî muzîkê, giraniya şevê li ser axaftinên mîvanên ji Tirkîyê hati bûn. Tenê Fehmî Demîr tiştên rast û girîng li ser pirsên nasname û mafêñ netewî yên kurdan anî ziman. Herdu mîvanên din, mina ku xebera xwe ji nasname û çanda Încovêyan û kurdan qet tune bûn.

Di ``Şeva Încovê``de şemayeke diyaspora ya kurdên ji Anatoliyê li Danîmarkê derket holê. Ji aliyeke ve bi muzîk, govend û hîsên xwedî-





derketina dîyaspora
nasnameya Danîmarkê
kurd hebû. de qet ne-
Berpirsên hatin gotin.
Komela Ev kemasî
Încovê di bi piranî li
vê warî Ewropa di
de karekî nav xebatên
baş kiribû. komeleyên
Eger Fehmî herêmî de tê
Demîr ne xuyakirin.
hatibûya Bi go-
û axaftin- tinek din,
ek nekirîya, komeleyên



pirsgrêka kurd, daxwazên ziman û çandê li welat jî yê nedihatın bi-hîstin di şêva Încovê de. Rewş û problemên dîyaspora ku nasname û ziman li pêşiyê têن, di şeva Încovêyên herêman li diyaspora him ji ali-ye nasnameya kurd û him jî ji ali-ye jîyana diyaspora ``apolîtîk`` in. Lê, sîyasetmedarên ji ``welat`` têن, bi mîsyoneke sîyasi dîbin mevanê





komel û grubêni li dîyasporayê. Pir balkêş bû ku kesekî wek Atilla Kart hat Kopenhagê û di şeva Încovêyan de sîyaseta dewletê û CHPê ya înkarkirina nasnameya kurd anî ziman. Li Elmanya jî, carcaran parlamentên CHPê wekî Kamer Genç beşdarî şevêni Dersîmiyan dîbin û li hember ``hemwelatîyên`` xwe behsa Ataturk û Tirkîyê dikin. Eger ev kes ne parlamente bin, nikarin di şevêni dîyaspora ya kurdan de van şasîti û derewan ewqas eşkere bêjin. Lê, statûya mebûs yan jî serokê bêledîyanbûn pirî caran di nav kurdên dîyaspora de dibe avantajek.

Di salêni dawî de du pêvajoyêni nû di nav kurden dîyaspora de derketin holê. Di bin navêni gund û bajaran de şevêni çandî û muzîk têni çeki-

rin. Mêvanêni van çalakiyan pirî caran jî Tirkîyê û Kurdistanê ne û ew di axaftinêni xwe de ji aliyekê hîsên hemşerîtêyê pêş dixin, ji aliyê din jî sîyaseta partîyên xwe yên wek AKP û CHP dikin. Mixabin, pir caran ne partiyêni kurd ne jî rêexistinêni dîyaspora kurd têni dawet kirin. Divê ev kîmasî ji holê rabe. Bona vê jî, mijara diyaspora bi firehî bê lêkolîn û niqaşkirin. Kurdên Anatoliyê grûbeke balkêş a diyaspora kurd e û di Bîrnebûnê de ji aliyêni civakî, aborî, çandî û sîyasi bê lêkolîn kirin.

Di diyaspora kurden a li Ewropa hejmara kurdên Anatoliyê gelek mezin e. Li hinek dewletan wek Danîmark û Swêdê, piraniya kurdan ji Anatoliyê koçkirine û li vir cî girtine. Lê, heta niha hindik tişt



hatin nivisîn. Divê di dema pêş de ev mijar jî bi berfirehî bê ziman û nivîsandin. Çima ku diyaspora kurdan, tesîr û rola wê êdî wek rastîyek û beşek civata kurd ya dinê tê qebûl kirin. Li Elmania sala par bi dehan civîn û konferans li ser diyaspora kurd çêbûn. Qebûlkirin û parastina nasnameya kurd di navenda van çalakiyan da bû. Grûba kurdên Anatoliyê û rewşa wan a diyaspora jî, divê di vê çarçoweyê de bê zanîn û niqaş kirin.

Kurdên Anatoliyê li hemû dewletên Ewropayê belavbûne. Pêvajoya koçkirina ji welat û hatina Ewropa di salên 1960an de dest pê kir û hin jî berdewam e. Di wê demê de tesîr û guhartinên mezin di nav civatê de

pêk hatin. Bi rêya diyaspora, kurdên Anatoliyê, sedsalan şûva, bi kurdên Kurdistanê ve bi hev gihîştin û xwedî hîsa netewî bûn. Li vir gelek kesan zimanê kurdî yê nivîskî hîn bûn û iro kovarek weke Bîrnebûn derdixin. Di dîyaporê de berhemên girîng di warê wêje (edebiyat) û muzîk bi dest kurdên Anatoliyê pêk hatin.

Ji aliye aborî jî, rola diyasporayê mezin û pozitîv bû. Kurdên li vir, him rewşa xwe ya aborî bi pêş ve birin him jî alîkarîyeke malî ya mezin dan malbat û gundên xwe yên Anatoliyê. Dewlemendiya kurdên Anatoliyê di çel salên dawî de bi saya pereyên koçberên Ewropayê de çêbû. Sedema koçkirina Ewropa bi piranî ji vê ye.

Bi rastî, diyaspora ne tenê bi tesîr û guhertinên pozitîf ve girêdayî ye. Li aliyê din, diyaspora gelek problem û astengiyan derdixe holê. Jiyanek di nav civat û çandeke nû bi serê xwe zehmeteke mezin e. Problemên ziman, perwerde, tendurustî û kar bi têrê hene. Bona vê, çiqas derfet û faydayêñ koçberî hebin jî, jîyana diyasporê bi temamî divê herdem bê ber çav û şîrove kirin.

Koçberî û çêbûna diyaspora, di dema îro de li her derê dinê tê xuyakirin. Tê gotin ku globalîzm vê pêvajo xurttir kir. Koça kurdên Anatolîyê ya Ewropa berê globalîzmê dest pê kir, lê hîn berdewam e. Heta berê çend salan, civata diyaspora bi pirranî bala xwe dida welat, û planêñ xwe li ser vegerînê awa dikir. Lê, neslên nû û ciwan ewqas ji welatê dê û bavêñ xwe dûrketîn e ku îhtîmala vegerîne nemaye. Bo koçberan, bi taybetî kurdên Anatolîyê li Ewropa, diyaspora êdî bûye ciyê welat.

Kurdên Anatolîyê bi piranî li çar dewletên Ewropa cî girtine: Danîmark, Swêd, Swîsre û Almanya. Cudatî û taybetîyên diyaspora yan li van dewletan gelek hene. Bona vê, divê rewş, şert û problemen kurdên koçber ji Anatolîyê li her dewletekê tek û tek bê ber çav û şîrove kirin. Li aliyê din, daxwaz û

problemên wekhev jî hene û divê di rojevê de bêñ niqaş û çareser kiran. Pirsa naskirina nasnameya kurd, hinbûna zimanê kurdî û parastina çand li diyasporayê li hemû dewletên Ewropa serê rojevê de têñ. Wendebûna nasname (asîmîlasyon) bo diyaspora ya kurdên Anatolîyê jî rîskeke mezin e û yê di pêşerojê de hin jî xuya bibe. Bo van mijar û probleman, konseptek bo parastina nasnama kurd û dijî asîmîlasyonê pêwist e. Ev konsept, divê ji aliyê hemû kurdên diyaspora yêñ li Ewropa pêk bê.

Çalakî û pîrozbahîyêñ li diyaspora bo parastin û pêşvebirina nasnameya kurd girîng in. Medya kurd weke televîzyon, ji aliyê ziman û çand êdî roleke navendî girtiye. Di dema globalîzma îro de, nasname û çand bi derfetên telekomûnikasyon li der sinorêñ dewletên netewî de cih digrin û xurt dibin (cihê civakî ya transnasyonal). Kurd ji bo vê pêvajoyê nimûneke baş in. Tê xuyakirin ku kurdên li welat û li hemû diyasporayan (Anatolîyê, Kafkasya, Tirkîyê, Ewropa hwd.) xwe di bin nasnameyek tenê de ifade dikin. Ew jî, nasnameya netewî ya kurd de. Li aliyê din nasnameyêñ taybetî yêñ herêman, ol û zaravayan jî hene û bo nasnameya netewî ne astengiyek e.



Şev, festîval û civînê li diyaspora bo nasnameyeke netewî û sîyasi girîng in û divê her dem bibin. Bi taybetî kurdên Anatoliyê di salê dawî de gelek çalakiyên wisa kirin. Festivala kurdên Anatoliya Navîn her salekê li dewleteke Ewropa tê organîze kirin. Li Swêdê çend caran

şevêne Bîrnebûnê bi serkeftî çêbûn. Li Almanya û Danimarkê bi navê gundan komele awa bûn. Van komelan şev, civîn û gel organîze kirin. Bi kurtî, diyaspora kurdên Anatoliyê di rewşike dînamîk de ye.

Ciqas civatek koçber xwedî zana-bûna diyaspora be, ew ê ewqas jî jîyana diyaspora daxine dest xwe û biguhare. Bo parastina nasname ji aliyekekê, bo entegrasyon ji aliyê din divê koçberên kurd li Ewropa niqaş, xebat û projeyên xwe bi pêş ve bibin. Kampanya kurdan li Almanya ji bo qebûlkirina nasnameya kurd gaveke wisa ye û divê ji aliyê kurdên Anatoliyê de jî bê destkirin.



Malhuleke siyasi

Nuh Ates

Serwezirê Tirkîyê, Erdogan di kombûneke partiya xwe, AKPê da xewera rîlibervekirina dersa kurdî ya hilbijartî mîna mîzgînekê aşkere kir. Wî di kombûnê da wer gotiye:

„Di çarçiwela Qanunê Derheqa Hînbûna Ziman û Zaravayên Cûda, di bin navê ‘Ziman û Zaravayên Zindî’ da telebeyên me yê bibin xwedîyê imkana hêvîsîna (hînbûna) ziman û zaravayên cîwari. Nimûne, eger têrî xwe telebe bêñ ba hev, kurdî mîna dersa hilbijartî yê bê dayîn, biberxistin û hêvîsîn. Ev gaveke tarixî ye!...“

Çeşîdên mîna êlîtên tîrkan yên ku navlêkirinên neçê û zikêşandî îcad dikin li rû dunyê kêm in. Çin ê pêva ne, nimûne sewa ku navê kurd û kurdî nînin ser zimanê xwe û nekevin belgeyên resmî, nav û navlêkirinên mîna „zimanê neaşkere“ yan „zimanekî nêzanîn“ bikar tînin. Yek ji wan navlêkirinan jî „ziman û zi-

raveyên zindî“ ye. Ci navlêkirineke ecêb e, ne weng e! Ew û zimanên mirî tîne bîra meriva. Ci qey navê „ziman û zaravayên li ber mirînîyê“ yan jî „zimanên cankêşî“ lênekirine!?

Va navan ê hîn rind lêbihatana. Di eslê xwe da, li Tirkîyê ji xêyrî tirkî,

ziman û zaravayên zindî li ber mirîniyê ne. Namzetên cankêşiyê ne. Cankêşîyeke bi destê esîmîlesyonâ bi zorê ye.

Li gorê hayadarîyên ku hetanî niha hatine belavkirin, dersa kurdî ya hilbijartî dê li ser dexwaza dêûbavan di refa 5an ya perwerdeya bingehîn da, serî heftê 3 û 4 seeta li mektewên navîn bê pêşkêşkirin.

Tiştêkî ecêb e, giregirêne dewleta Tirkîyê xwe wekî mamhosteyê her merem û mijarê dizanin û ji xwe ra heq û wezife dibînin ku derheqa derd û dexwazên kom û miletên ne tirk da bêyî riza wan fetwa bidin.

Bînin bîra xwe, çendekê di ber Erdogan, şûngerê (cîgit) wî, Arinç gotibû kurdî ne zimanê bajarvanî ye û lewma bikaraniya wî di qadêن şîretkirin û perwerdekirinê da ne rewa ye. Di kar û gotinêن bêqimet-kirina zimanê kurdî da Erdogan jî ji şûngerê xwe name. Ew jî perwerdeya kurdî qebûl nake û zimanê kurdî tenê rewayî dersa hilbijartî ya li ser serîlêdane (bergerîna) dêûbavan dibîne. Tê bibêjî ew ï xêra belav dikê. Bi ser da jî, dipê ku kurd sewa vê „gavê tarixî“ jê ra minetar bin û destan li hev xin.

Sêyr e, serwezirê Tirkîyê, te bibêjî wî hay je şorê devî xwe neye, makzimanê hevwelatiyên kurd, yê niştecîhêن Kurdistanê mîna zimanêkî bîyanî dihesibînê. AKP xwaztekên kurda yên heq û rewa kel û kol dike û wekî hacet ji bo bêhêzkirina hereketa kurdan bikar tîne. Ma TRT şes jî ji aliyê sîyasî da bi amanceke wer nehat û naye bikranîn?

Ma yeke ku biwe, kurdan li weletê xwe mîna koçber û bîyanî yan jî zimanê wan wekî zimanekî bîyanî bihesibînî û rewayî dersa hilbijartî bibînî û vê jî mîna gaveke tarixî nîşan bikî. Ma ev ne durûtî ye, heq û azadiyên ku ji tirkên Qibrisê, Almanya, Kosova, Yonanistan û

Bulgarîstanê ra rewa dibînî, layiqî kurdên Tirkîyê û Kudistanê nebînî!

Li gorê hen zanyar û çavdêran nîşanên cîhgirtina zimanê kurdî li Kurdistanâ Bakur di refa zimanên li ber miriniyê da her ku çû zêde dibin. Ji gumanê ne dur e, ku zimanê kurdî di nivê yekem ya vê esrê da ji avûrûyê esimîlesyona ku 90 sale tê domkirin bigihê qonaxe cankêşiyê.

Zanyar û şâîrê kurd yê bi nav û deng, Ebdula Pêşêw çend meha di ber vê, pîstî vegera xwe ya Kurdistanê (Başûr) di panelekê da dazanîn ku zimanê kurdî li ber metirsîya jinavrabûnê ye û bangî hikûmeta Herêma Kurdistanê kir, ku ew akademiya zimanê kurdî ava bike, zimanê kurdî biparêze û nehêle ku ew ji nav rabe.

Ma dersa hilbijartî dikane ku pêşî li jinavrakirina zimanê kurdî bibire? Makpirsa di derbarê mijara dersa kurdî ya hilbijartî da ev e.

Ji bo zimanekî ku ketiye nav heyam û qonaxa cankêşiyê dermankirineke redîkal pêwîst e, wekî şokterepîyekê. Ew jî derhal destpêkirine perwerdeya kurdî ye. Jî vê kêmter dersa kurdî ya ferz e, ne ya hilbijartî. Derveke ku pê telebeyên kurd ji destpêkê da hetanî dawîya perwerdeya navîn ziman, edeb û tarixa kurd û Kurdistanê bihêvîsin.

Kêmtirî dersa ferz têrê nake û gereke ku meriv pê razî nebe.

Dersa kurdî ya hilbijartî, ku nêt ne ew be jî, pêşî li perwerdeya bi kurdi digre û wê bi derengî dixe. Bikêriya wê, bi gotina almana, mîna cilkek ava li ser kevirê sorkirî ye. Dersa hilbijartî, her çiqas ku ew wekî gaveke erêni xuya bike jî, nikane pêşî li cankêşîya kurdî bigre.

Lewma ew heq dike ku wekî malhu-leke sîyasî bê binavkirin.

Manîdar e ku ev „gava tarîxî“ di qonaxeke han da tê avetin: Şer diqe-wime, balafirên şer herdê Kurdistanê bombebaran dikin, xweza tê wêrankirin, sivîl, gerilla û esker tên kûştin, yên hilbijartî jî tevê bi hezaran meriv tê binçavkirin û mehkumkirin...



Pîrozbayî



Cahit Duran, hevkarê me li vê havînê, bi hezkira xwe, Hulya re zewicî.
Em ji wan re jiyanekê dûrûdirêj, şad û serkevtî li ser balgiyekî hêvî dikin.

Piroz be!

Redaksiyona Bîrenûnê

Awirêن efsûnî

lê lê dilberê
bi sonda hesreta dilê bêsebir
li benda bixêrhatina te me
li danê êvaran
di kolanên te yên kavilbûyî re
derbas dibim
li nav peşkên barana payîzê
bêhna henasa gewriya te
dikişînim nava xwe
bi saya awirêن dilê xwe yê perîşan
ferhenga hestêن bedena te
dixwînim
hîqehîqa bedewiya kenê te
li zozanên laşê xwe
direşînim
min barê şewata evîna te
li piştä xwe yê xûzbûyî
siwar kiriyê
ji kaniya bejna te ya zirav
ava kewserê dinoşim
bi zimanê çaxêن rabirdû
melûliya awirêن te yên efsûnî
radimûsim
ez di frekansa sewdaya te de
pêl bi pêl dîn û har dibim
te xewa şevêن şîrîn ji min dizîn
û roj li min herimandin
li ber gewriya sîng û berê te
serxweş û xemkêş dibim
li hesretkêşıya eşqa te

dilê min ê keserkêş westiya
û hinav li min peritîn
were
bi lezeta lêvên xwe yên hingivî
sînorêñ bedena min dîl bigire
li firtoneya deryayêñ balûpal
bibe bendergeha keştiya dilê birîndar
bibe pêvebera helbesta nîvco mayî
bibe kirdeya hevokêñ şikestok
bibe rengdêra peyvîn rengvemirî
di nependiya çirûskêñ stêrkan de
bedewiya gerdena te ya spî dibînim
li kolanêñ bajarê dirinde
li şopa siya gavêñ te
digerim
sal û demsal
di agirê ihaneta rojêñ te de
tarûmar dibim
ji laşê heyva çardeşevî
wêneya te li asîmanê sayî
dineqışînim
ez qedeха xwe
ji hesreta tunebûna te
dadigirim
û axînêñ tenêtîya xwe pîroz dikim

Xizan Sîlan

Agir, koz û okyanus ...

çîyan

tirejêñ rojê teze vedixwar in

û mîwanan xwe

xwe li ser singêñ zinaran dirêj kiri bûn

ez serî sibê

li navbera erd û ezman

derbeder û bi hesret barkirî bûm

çîyan çiqas mest dibil bila bibin

tu caran veşariyê xwe eşkere nekirine û nakin

daku mamostan li serî çîyan agir qebul kiri bûn

qertelekî roj li perikên xwe bar kirîyê

û yî avê çemên bin erdê li hêlinan belav dikê

ez ne xewgerê çolan û rêvîyê rîyêñ spîral im

ez revîyekî îsyankar im

li pazaran karî min nînê

ez î bi şev û roj doralîyêñ xwe

û ezmanê temaşe û tam dikime

pêxwas û serkot digerime

dilê min gogek agir

gezaba min petîya rojê

mejoyê min gilokek koz

çavêñ min kanîyêñ okyanusan

guh didime ser hundirî xwe û tebîletê

ezî serê xwe û ruhî xwe
ji fikrên gemarî û
ji dengêñ qilêrî azad
û cavêñ xwe pak dikime

ez î dixwazime ku
bê ku zerarekê bi zîndîyan û mirîyan dim
bi hemdî xwe bijîm

jîyanê ji serî da heta dawîyê tazî bikim
li hestirkêñ ku dirijên sîwar bibim
bi lez axê dûnê bişawîtinim

lêmê ku di hundirî mêtôyan da
tîrş bûyî bi bîreke kûr da biherikînim

teseliyên min ne cergên zincirên koletî ye
û ne jî xwedîyên îradê min in

Seyfi Doğan

Li tetîla havînê berehevkirina şoran

*Nuhê Hecî Malê Hersîd (Nuh Ates)**

Li tetîla havîna îsal min du hefte li Xelika (Karacadag), gundê ku ez lê hatime dunyê derbas kirin. Em ê weng hû bûne, Xelika edîn qeseba ye, lê kes nawe qeseba, Xelikanî gîşt dibên, gund. Wekî her carê, vêcarê jî ez li gund bûma guhdarê gilîğotinên kurdî yên ku min qet nebihîstî yan jî jibîrkirî. Hen jî hebûn min dizanîn, lê bi fikra min di karê nivîsandinê da nehatibûn yan jî kêm hatibûn bikaranîn.

Di eynê wextê da, xwarzî û brazîyen min jî li gund bûn. Ew jî ji Elmanyayê hatibûn. Rokê, xwarzîyê min, Bulent ji brazîyê min, Memo pirsiye gotiyê, “Nuh çîr dike?”. Memo jî gotiye, “ew î şora berehev dike!” va gotina bi min xwaş hat, ez pê kenîyam, pê xenê bûm. Lewma min ew kire sernivîs.

Erê, rast e, ez li gund şoran, peyv û gotinan berehev dikim û pê şâ dibim. Bi gotina Xelika, pê qirika xwe heldikişînim. Berhevkirina şoran di demeke ku hêlandin û ji navrakirina kurmancî li Xelika jî bileztir dibe, bi min mîna karekî kutsî tê. Nexemî,

neçarî û bêdengiya niştecîhê Xelika li hember xesar û zîyanêن giran yên betara esîmîlasyona bi salan, min sur dike, teşwîqe berhevkirina şoran dike. Bêguman, zimanê kurdî li Xelika jî zimanekî nîvhêlî ye, zimanekî şikestî ye. Berê wî berve bîrbûnê ye û ro bi ro wenda dibe. Trejedyek e û li ber çavan diqewime, lê tu yê bibejî xwedan wê nabînin yan naxwezin ku bibînin. Tu dixwazî ku bibêjî, kesek tune kilameke li ser bistre û bibê, “zimano ha zimano/ vê kes û vê xudano/ malwêrano û derdgirano/.... û meriv pê bigrî û şînê bike.

Nîvê niştecîhê Xelikan li bajarêñ wek Anqere, Qonya û welatêñ Ewropayê ne. Havînê pirê wan têñ gund, tetîla xwe li wir derbas dîkin. Zarokêñ piranîya wan yên ku dervayî gund têñ dunyê û mezin dibin bi kurdî nizanîn yan kêm dizanîn. Yên ku li gund têñ dunyê û mezin dibin jî wekî dêûbavêñ xwe bi zimanekî tevlihev, nîvtirkî û nîvkurmancî deng dîkin.

Her ku peyveke kurdî ya ku min

qet nebihîstî yan jibîrkirî dihate guhê min, cîlê min radihîste qelem û xetê û ew dinivîsand. Bi vî karî wûjdanrehet dibûm. Mîna ku min jîyanek xelas kiriwe yan tiştekî giranbiha, wekî entîk dîtibe.

Carna şor û gotinên ku min qet nebihîstî yan jî jibîrkirî dihatin bilêvkirin, ez ecêb dimam. Min ji xwe bi xwe ra digot, "min çîma hay je vê neye!" yan jî "min çîma va şora qet nebihîstiye?" Di encamê da, êz pê hêsiyam ku ez di deh-dwanzdeh

saliya xwe da ji gund derketime û sewa xwendinê çûma bajêr û tenê li tetîla hatime gund. Paşê di bîstûdu saliya xwe da çûme Elmanyayê û çel sal e ku li wir im. Lewma kurmanciya ku min ji dêûbavan, ji malbat û hevalan, ji civata gund hêvisîbû, bisinor bû, kurmanciya zaroktiyê bû û bi kêmanî bû.

Aniha, ez ê bi vê nivîsê va çendeka ji van gilîûgotinên ku min berehev kiriye wekî nimûne pêşkêşî xwendivanên Bîrnebûnê bikim.

Şîretên/gotinên bavûkalan

- Vê tala û vê sir cîhhîşt
- Kubar e, di xan û xilafê xwe da ye
- Mî a di serî bibire, di bera xwe nabire
- Heft bavê çê, îla jî şîrî dê
- Warine min û vê dûbêrê, gund li me rawû sérê
- Va qeyasa li ser birayên min kitkitkî biwe (sond)
- Hu tê bizê (bi bereket be, ji bo heywana tê gotin)

Çend şor û gotin

Şûni lêkirin: Ev bi meneya, bi şûn kirin, xwedî lê derketin, dest bi ser ra girtin tê gotin.

Lê persîya bûn: Bi meneya lê civîyan, li ser kom bûn. Nimûne, çûcik hatin lê persîya bûn, pak kirin...

Mafqa/ bi mafqa bûn: Ji hev ra rind yan bikêr bûn

Berşû: Kincê berşû bi xwe ra birin. Şû bi meneya nove/dor jî tê bikaranîn;

şû hefte. Li gore ferhenga şû mîr e û şû kirin, tê meneya mîrkirinê.

Sêvandin/sêwandin: Di kilameke Xelika da, ya ku Zewê Çûc straye, gotina „va çiyana çiyayê sêwandine/Êmîlkê male bavî min dûv gerandine..“ derbas dibe. Li şenahiya dohla (deweta) xwarziyên min, Zewê û Atila, Haznoyî Huçê Emê ji cemâtê meneya „sêvandinê“ pirs kir. Tu kesî meneya wê nezanî, lê çend

menedayîn hatin bilêvkirin: Ji wana
yek sîwan/sîwandin, ji koka sîyê
hatiye meydana ya din jî sîvahatin/
sûvahtin yanê xeyîdîn e.

Verêkirin û vexwarin: Pir cara di
listikan da, di listikê xumarê da jî
tên bikaranîn: Verêkirin tê meneya
wendakirin/bibinketin û vexwarin
jî tê meneya qezenckirin/viserketin/
viserxistin

Malkesik bîyo(bûyo): Bi meneya
lome lêkirin, wekî malixeraw bûyo te
bikaranîn

Mizêç, bi mizêç: ji bo kesê ku di
xwarinê da dibijêre ra tê gotin

bînemî/biwenemî/bonemî:
nexwaşîya sara

Tat: binê çêm, gol, derya

Depiş: jina di iş û karan da jêhatî,
serketî

Pê hate ser: pê qayil bûn, pê razî bûn

Kete ser: îkna bûyîn

Hevgel/hevgelê hev: hevalê hev yê
şivaniyê

Birûboş û boşûbetal: bê iş û bê kar

Ornag: cehre, sima

Bargirtin: berwe kufkîbûnê çûyî, ji
bo tişte xwarinê

Hanore/Hanghore: siwê zû, berbangê

Avger: Bi meneya şivan tê gotin. Di
kilameke Xelika da va gotina derbas
dibe:

*“Înê înê şivan înê,
huro ware çoyî xwe dîne,*

*axayî te ma here
avgerekî xwe i din biwîne..”*

Vêr vêr ra, pêda pêda, hen bi hen:
Giran giran. Hêdî-hêdî, peyderpey
Surî (sorî)/ Surkirin/: Xwilî kirin,
qehirandin.

Sûrî lê meke: zulime lê meke
Ciqim: berferehîyeke veqasî
hembezekî ra digotin. Wexta ku
nîsk bi destâ diçinîn, digotin, “min
çiqimek nîsk çinî”

Şerpelî: Bi kesê ku destên wî li
îş karan naye, destpî lihevpêcikî,
sistûpist û pûç ra tê gotin “Peeh,
şerpelî ye çî!” Wekî nifir jî dihate
gotin: Wîiiyî, ku tu şerpelî biwî!

Dîwane: budale, “qet qalê wî mek e,
ew i bûye diwanekî!”

**Navê çend gîya û hesinayî yênu ku
teze têne xwarinê yan pê şîv têne
çekirin**

Emtişik, lehmçûcik, babirce,
merdîmelax, lehmkusî, xîlf, kereng,
pîvang, tekilcan, xerdel, quisik,
pung, patpatik, gizérê bejî, tapan

Nasnameya binemalî

Malava be, editorê Birnebûnê, Ali
Çiftçi di hejmara Bîrnebûnê ya 52
an da bi nivîseke di bin navê “*Li koka
xwe bigere*” bal kişandibû ser mijara
nivîsandina nasnameya binemaliyê/
malbatê. Min jî zûva da dile vî tiştî

hebû, lê heta niha nebû nesîb. Min xwast ku îsal sewa her du lawê xwe nasnameya (secereya) Binemalîya min û jina min li ser xetê (kaxizê) binivîsim. Min haziriya xwe kiriwû, ji bo vê cedwelek çekiriwû. Min ji bo berehevkirina malumatan, li gund û li Anqerê ji mezinên her du malbatan pirs kirin.

Serêşîya vê mijarê ya sereke û aşkere ew e, ku di derheqa nasnameya her du malbatan da hayadarî pir kêm e. Malumatên binivîskî tunin. Ji kevneşopiya bavperêstiyê tê, hayadarîyên ku li ser binemaliyê hene pirtir li ser hêla bavê ne, li ser

hêla dêyê kêm in.

Bikêriyek ew bû, her ku min mezinên malbatan zêde bidengkirin didan û pirs jê dipirsîn, Hayadariyên nû derdiketin meydanê. Nimûne, di saye pirsên han yên di derbara nasnameya binemaliyê da, ez pê hêsiyam ku bavê bavpîrê min, Hec Reşîd merivekî mîrxas bûyê û di wexta xwe da sewa firotinê pêz ta dibiriye bazara Bexdayê û di ser Şîrnexê ra diçûye. Şîvanên malbatên din yên ku xwediyê keriyê pêz bûne, xwe li wî digirtine û dipane ku kîngê Hec Reşîd birê diketiye, ew jî bi wî ra diçûne.

* *Min berê jî çend cara nave xwe ye kurdî bikar dianî lê mixabin ne herdem. Ji niha şûn da ez ê navê xwe yê ku li gundê xwe pê têm naskirin bikarbînim. Ez vê, li hember esîmilesyonâ bi zorê û helandin û tunekirina navûnîşanên kurdîtiyê hewce dibînim. Ne şâş e, ku meriv di mercen iroyî da, helwesteke ha weki pîvana kurdbûnê û durustbûna ji aliyê xwastina heq, edalet û wekheviyê binav bike. Ez ê navê xwe yê bi tirkî jî li hêla navê kurdî di kevane (parentêzê) da bikarbînim.*

AGAHDARYEK GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di **Bîrnebûnê** de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincen wan ên berê bi ci awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesen ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenedîya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Kurdê Dersimê ku nefî (sirgun) hatin Konyayê ra hevpeyvînek

Ibrahim Korkmaz

Dema ku ez diçûm lisê, du hevalên min hebûn. Navê yekî Memet, yek jî Alişan bû. Wan hevalan digotin, mezinê me ji Dersimê nefî hatina Konyayê. Pir merivên me hatine kuştin û nefî Türkiyeyê her derkê kirine, zef merivên me, em nizanine ji kuderê re nefî kirina, me îza wana wenda kiriye. Wê demê her tiştek kedexe bû, em ditirsiyan pir tişta, ji wana pirskin. Wana jî pir qalnedikirin. Ez bi 30 salı şunda hevalê xwe, Memet û Alişan gerîm, min nedit û min birayê Memet, Hesen Kurşun dit û min Hesen Kurşun ra hevpeyvînek kir. Hesen got, dewletê qetliyamek mezin li Dersimê kir. Zef merivên me hatin kuştin, gel seva canê xwe xilaskin, direviyan çiya, merivên ku dewletê digirtin, ya dikuştin, ya jî vagon têjî dikirin ew nefî dikirin. Eşîra me, ji Pülümür, Nazmiye, Kığı da nefî kirine. Pêsta hatine Konya Cumra, qeza Bozkirê, gundê Akvîranê. Akviran gundekî bi çiya û zinar e, tiştek nediriziya, hemû birçî mane, zahmet pir ditîne, pir me-

riv nexwaş ketine û mirine. Paşê çûne gundê Alibey Höyügü, vi gundi ji gelê Dersimê pir heznekiriye û navwana da pir şer derketine û heqeretên mezin ditine. Ji bo dersimiyan pir zahmet bûye. Ji wî gundi cih negirtine, edî edî hatine navça Konyayê. Pêsta sol boyax kirine, paşê li bazaar gênim, hammalixî kirine. Pişti demekê bi şunda jî di her karî da kar kirine. Salên 1950-60 da ef derketiye ji bo dersimiyan. Niviyê dersimiyan çûne welatê xwe, Dersimê.

Hesen Kurşun ji bo xwe ji got; –Ez ji eşîra Afdela torinê Memê Hurko me. Ev eşîra Afdelan hîn li Pülümür, hundirê Dersimê, Muş, Varto, Xinis, Bingöl Kigi, Erzincan, Geliyê Sansa cih girtine, Aliyekî wana li İzmir, İstanbul, Adana, Mersin û li Konyayê dijin.

Di serhildana Dersimê de zef şer kirine. Hesen sala 1970' da tere eskerê, fakat li eskeriyê pir zahmet pê dikin. Hesen ji eskere direve (firar dike). Tere Stanbulê, Deniz Gezmiş û hevalê vi nasdiike, ji bo karê politika Hesen dişinin Dersimê, devlet


hemû malbatê Hesen hiltine binçava, pir tiştên xirab tînin serê wana. Hesen li Erzincanê, tercan(sansa) li Pira Mutî, İbrahim Kaypakkaya va hevdi dibînin, ji bo karê şoreşê dengdikin û ji merivên şoreşker ra alîkariyê dike. Bi salekê şunda İbrahim Kaypakkaya li dijî eskera şer dike û birindar dibe. Hundirê Dersimê da bi konvoye pir esker derbas dûbeve;

Hesen: Di destê min da tufeng hebû feqet leşker zef pir bûn, min nikaribû tiştekî bikira! Ew, heyela mîna kulekê di zikê mim da maye.

Hesen dikuliya, min ji Hesen pirs kir, çîma kek Hesen tu dikuliye?

Hesen: Min di sala 1990î da li Wanê di şantiya Karayollarıyê de kar dikir. Di nav PKK û eskeran da şer derket, ez birindar bûm. Komutan li min pîrsî: tu li Pkkliya şikayetçi yî? Bersiva min ji, ez di nav agirê we herduyan da mame, ez nizanim kê ez birindar kirim. Ez kesekî ne şikayetçi me. Komutan ji min pir hers hat, şor min ra kirin û ez ji kar havêtîm. Ez niha pansionist im (emekli) û partiya CHPê de kar dikim. Sala 1989 da Konya, Karatay da, ez ketim seçimê, ji bo şaredariya Karatayê, min bi ferqeke pir kêm wenda kir.

Min serokiya CHPê li Karatayê kiriye. Paşê Deniz Baykal, ez ji par-



tiyê avêtîm û got: tu ne CHPlî ye! Tu komünîst û! Dema Kılıçdaroglu bu serokê CHPê, ez bume endamê komîta CHPê ya disiplinê. Kılıçdaroglu pismamê min e.

Em Dersimî ji hundîra Konya û derûdora Konyayê 770 mal in û 5000 reyê me heye.

Ez ji malbateka ji sulala deda hatim û ez bi xwe jî dede me. Ez î karê polîtikayê cîbihelime û ji bo ol kar bikime. (*Li ba alevîyan Dede kesê ruhbanî ye ku serokatiya ibadet û ci-vata Cemeviyê dike*)

Kalê Hesen salekê tere, şenaya Hacibektaşyan, polîs wî dike zindanê, pir işkence pê dikin û rûyê wî, diruçkinin.

Hesen: 10 sal in serbestî zide bûye û em li merivên xwe yên wendabûyî digerine. Pêşda ez ji apê xwe geriyam. Me ew li Afyon-Emirdag li gundê Kemerkaya ditin. Feqet apê min çûye ser heqîya xwe û za-

rokên wî em qebul nekirin. Ew bûne sunnî û kurdi nizanine û ji me reviyan. Çend rojan bi şun da hatin Konyayê û gotin: em ditirsine. Eger em bêjin em kurd û alevî ne, tirkê me ji gund derxin. Heta niha ji hundir û derûdora Konyayê, merivêne me hene. Li Kadınhanê sê mal, li İlgin gundê Misafir 4 mal, li Çavuşliyê 3 mal, Ağalar 2 mal ditin. Akşehir bermende(Kuruçay) 2 mal, navça Akşehirê 12 mal he ne. Karamansidirova, yeşilyurtê da ji dersimî hene. Afyon Kemerkaya, û Aybedesê hene. Paşê hinek kurd ji Afyonê çûne Ereğliyê û gunde Özgürler ava kirine. Gundê Zengenê nivê xwe Dersimî ne û nivê xwe ji Turkmenên alevi ne.

Alanarka, Tahta Köprü da ji hene. Li Akşehirê tirba Seid Mahmut Hayranî heye. Mahmut Hayrani la-wikê Dedeyê Munzur û pîrê eşîreta Kureyşana ye. Di salêن 1200-1300 jiyaye. Li Akşehirê miriye. Niha me li Akşehirê cemevi vekiriye. Ji her aliyê Turkiyê da gel, goristana Seîd Mahmut Hayranî ziyaret dikin.

Li Konyayê hîn jî resmî cemevî tune! Lê xelk bi veşartî îbadeta xwe dike. Valiye Konyayê resmi musade neda. Got: eger ku resmî be, tehlika ji bo jiyana alevîyan zêde be.

Gundê Zenganê hemû alevî ne. Lê dewletê li wir mizgef (camî) çêki riye. Kesek neçû mizgeftê. Xelk niha wira wek cemeviyê bikartîne.



Çend peyv

Mem Xelikan

Yekitîya erd, ziman, çand û jîyana psîkolojîk faktorênetewîbûyînê ne. Ji van faktoran, ziman yê yekemîn e. Jîyan, bi vî didome. Çand, bi vî tê holê. Ji bo vê yekê jî, kolonyalîst dema dixwazin netewekî asîmîle bikin û ji holê rakin, cara yekem zimanê vî qedexe dikan. Her netewek, bi ziman û çanda xwe jîyana xwe berde-wam dike. Ü li ser pîyan dadiweste. Xwe û navê xwe diparêze.

Kurdan jî, her çiqas axa wana, cih û warênen wana, bi kurtasî welatênen wana, ji aliyê kolonyalîstan ve hatîne perçekirin û li hev parvakirin jî, qet ji çand û zimanê xwe dev berne-dane. Pir jî xwaş kirine. Va ya, faktoreke bingehî ye ku hetanî iro li ser pîyan mayîne û jîyana xwe parastine.

Kurd, iro çawa ji bo rizgarî û azadîyê kar dikan; dixwazin ewkas jî, ji bo ziman û çanda xwe kar bikin. Ew kara jî, beşike ji şerê rizgariyê ye. Wa ya, ji bo jîyan û hebûna mîleteki girîng e. Iro, kurd li hem-ber perçebûn, zilm û zorê li ser pîya ne, ji bo azadî û rizgarî berxwedidin. Di wê yekê de; para jîyandina zimên û çandê, hûn jî yê qebûl bikin ku pir mezin e.

Alfabê, rêziman û ferheng sê stûnênen zimanekî ne. Ji vanan ferheng, ji peyvan tê holê. Ji bo her zimanekî, piranîya peyvan girîng in. Her zimanek, bi piranîya peyvan dewlemend e.

Çend roj in, ez ferhengen kurdî, ber çavan re derbas dikim. Min dît ku pir peyvîn li cem me, li aliyênen Kurdênen Anatoliya Navîn gel di jîyana rojîn de, pê diaxife di ferhengan de cih negirtin, hene. Ez ê, ji wana çend mînakîn li jêr bidime. Bawerim li her derekê, peyvîn di ferhengan de cih negirtî hene. Gundênen me ji bo ziman û folklor çavkanîyênen mezîn in. Pêşniyaza min, her heval-lek li aliyê xwe, peyvîn ji dev mezi-nan dibîhîzin ku di ferhengan de tu-nen, not bigirîn. Wan, ji Bîrnebûnê re bi rêkin. Berpirsiyaren Bîrnebûnê jî, wan arşîv kin. Wanan, dema sazî û hevalna ji bo ferhengek nû şuxuleke wana bû, peyvîn di dest de di arşîvî de bidin wana. Bawerim, şu-xuleke wisa ya ji bo dewlemendîya zimanê me baş bibe. Dibe ku, ji mînakîn min, peyvîn di ferhengan de cih girtî lê, berçavênen min neketî jî hebin. Ji bo wê, bibaxşînin.

ALÊŞ: Pez ji mêxel rakirinê re dibên. Peyveke ku piranî şivana bi kar tînin.

– Heso, pez ber ve girikî Malê Mircê alêşke!

BERBİZAX: Di argoyê de, bi kêf e.

– Nêzikî vî nebe. Ew, va rojana pirr berbizax e.

– Fat, pir bi depiş e. Hetanî min qûçek çinî, wê sê qûç nîsk çinîn.

FÎRK: Êşa ku, ji nişkave dikeve piştê. (Lumbago).

– Memo, nikare ser xwe daweste. Firk, bi pişta vî ketîye.

GEREM: Dema ku pez hêdî hêdî bi koması dicêre.

Dem e dem e keko deme

Pezê kekî min diçêre

Li hewşoyê Mixkê li geremê.

ji kilama Memê bi Çûk. ku li ser birayê xwe gotiye.

GULMAST: Xwarineke şivana ye. Şîr û mast tevlihev dîkin û dixwin.

– Ez, duh çûm Fêza Morik, cem şivanan. Ji min re, gulmaste tek çeki-rin, çiqas xwaş wû.

HEMÊLİ: Bi cih kirina çêrandina keriyên pêz

– Hemo, pez hemêlî neqewê ke!

HEWÊNÎ: (dişlik) Bêhna xwe pê were. Bi hebûna wê, şad bibe.

– Besê, carek were cem min rûne. Hewêniya min, bi te tê.

HEWT: Ji yên, pir dişuxule re dibêjin.

– Dêste vî nede. Maşella Miço, huro ketîye hewtê.

HOT: Gog.(Goga lingan, hota destan, hota ço... h.w.d.)

– Beko, tu yê bi hota ço bilizî?

KEM: Guh birî. Ji bo hêwanan tê gotin.

– Kerê me, yê kem.

MAZMAN: Pezê nêrî sê salî û xesandi ye

Pezê kekî min mazman e

Nişanê xwe pîli paşîyê bi qetran e

ji kilama Memê bi Çûk. ku li ser birayê xwe gotiye.

PİŞKANDÎN: baran ku giran giran dibare.

– Fato, kinca berhevke baranê dipişkînê.

PÜSKANDÎN: destpêkirina berfbarînê. (pûkandin e)

– Wî pezi, dêkin gomê. Berfê , dipûskînê

QİJBELEK: Reng bi reng. Bi tirkî: Alaca (reş û spî re qijbelek dibêjin.)

– Fîstanê qijbelek li xwe kirîye û xwe ba dikê.

XO: Na, lo!.. Bi tirkî: Yok ya!..

– Xo!.. wer got?

ŞÎLK: Çata eniyê. (Alın çatısı)

– Rehet rûne. Zêde deng meke.

Ez ê, niha şîlkê eniyê de vêdim.

ŞÎRGÎNÎ: Zêde hezkirin. Bi tirkî: Vurulmak, tutulmak.

– Te dî ? ka qet, ji Gulê vetiqetê? Î şîrgînî bûye.

TERMÎ: Perçem, kakûl (temûrî)

– Ez, qurbana termîya zêrinî.

TÎSKEK (Toskek): Pir hindik.

– Zexê, xêra xwe ji wir tîskek xwê bide min.

TÛLEZ: Bê iş.

– Heco, ne tu tişt e. Yekî, tûlez e.

ÜD: hediye

– Huro, Zexa zeya me hate mala me. Me, ew ûd kir.

EYAM (1): Rewşa hewayê.

– Eyam, huro pir sar e.

(2): Hissetmek. Gotin, Hecî huro gêrbûye. Sibê wir de, canê min hevdu dixwe. Mînak, li canê min eyam bû. (Eyan bi erebî ye. Yani diyar bû, zelal bû).

XEWAS: Xew sivik. Zû bi xwe dihese û şîyar dibe.

– Gul, pir hewase. Bi dengekî re, bi xwe dihese.



Ehmede Qêdir, İsmailê Dedê û Bekê Kejê, ji gündê Bildux, salên 1950î, (ji arşîva L. Kanar)

Bavo! Ez jî têm...

Nesrin Bayram

Bavê min sala 2003 çû ser dilovaniya xwe. Bavê min ditirsiya siwarî bala-firê bibe, ji ber wê jî hertim bi ere-bê diçû û dihat, lê nizanîbû rojekî dê termê wî bi balafira kargo vegere welatê wî.

Ez dibêjim: divê êdî ez vegekim, hûn dizanin ez cîma vê dibêjim?

Ji ber ku ez naxazim piştî ewqas ked û zehmetî, termê min bi kargoyê vegere welatê min.

Helbet peydakirina tabûta kargo jî ewqas hêsan nîne. Dema bavê min mir, em bi rojan man benda tabûta kargoyê. Termê bavê min di morga xestexanê de bû û li benda wê bû bigihîje xaka welêt.

Piştî zêdetirî hefteyekî, me karî em bi rêya kargoya Stembolê re termê bavê min bişînin Tirkîyê. Bavê min, ku di jiyanâ xwe de siwarî bala-firê nebibû, termê wî bi du balafiran derbasî welêt bû.

Şevekî nîvê şevê, bavê min bi tabûtê derbasî Enquerê bû. Di wê kele-kela havînê de li dunya li me hat hev û te digot qey herder tevizîye.

Me nikarîbû wê gavê term bibin gund, ji ber ku li gundê me morga tunebû, ez bawer im niha jî tune. ji

ber wê jî termê bavê min birin mor-ga nexweşxaneya dewleta ya navçeya Kuluyê.

Li nexweşxanê de jî, sistema elek-trikê xirab bû û elektrîka morgê ne-bû, ji ber wê jî termê bavê min heta sibê nîvro di wê germê de ma li wir.

Min herî dawî bavê xwe li ser mirîşoyê dîtibû. Nûr li rûmetê wî dîbarî û lîvên wî bi ken bûn. Ez ni-ha dibêjim xwezî min wê demê ew nedîtiba. 10 sal bi ser de derbas bûn.

Ez bawer im ber bi nîvro bû termê bavê min anîn mala me. Deriyê tabûtê vekirin û term jê derxistin û xistin nav tabûtek din û danîn qu-nice ku wî jê hez dikir.

Bo ku xismên wî xatirê xwe jê bixwezin, kefen li ser rûyê wî vekirin û herkesî rûyê wî dît. Di wê demê ez êdî mirim... Min ji xwe re got, en-cax wiqasî li termekî zilm tê kirin, ez li hev ketim. Li pêşıya min termê bavê ku dil nedida maç bikim, hebû.

Ez naxwazim tiştên ku piştre bûn, vebêjim...

Xweziya li ser xaka xwe miriba, laşê me jî wek ruhê me, ku li vî welatî xweşiyê nabîne, ji hezar û yek zehme-tiyan derbas dibe û dikeve bin xakê.

Vî dilî çi dît çi nedît... ez bûm şahidê wê jî ku hinek ji ber ku endamtiya wan ya fona termê tunebû, bi mehan li morgê de diman.

Xerîbiyê çi da me? Li hember tiştên ku da me, çi ji me stand? Min ev tişt ji xwe pirsîn.

Xelkê mîna me, ji serê sibê ve diçin kar û nîvê şevê vedigerin mal. Helbet herî zêde jî li restoran yan jî karkirê pîtzayê ne.

Jiyanek tijî stress û dûr ji mal û zarakên xwe...

Em 11 mehîn salê kar dikin û salê carekî diçin Tirkîyê û bo behn-vedanê temenê xwe difroşin.

Heta niha min nedîtiye yên ku dixebitin bi qasî wê jî temenê wan dirêj be û keda xwe bixun. Yanê tu dibêjî êdî ez ê tenê bêhna xwe vedim û xweş bijîm, yan mirov dikeve nav lepê nexwesiyyê yan jî tu dibêjî ez ê êdî bi malbata xwe re demê biborînim, tu dibînî tu kes li dora te nemaye.

Ez ê di heyama çend salan de vegekim welatê xwe. Ji bo ku ez êdî naxwazim ji ewqas tiştî bêpar û dûr bimînim. Ez ê bo ku nefesa xwe ya dawî li ser xaka xwe bidim û li rikê firotina temenê xwe, vegekim û bêhna barana ku li wir dibare, bikşînim kezeba xwe...



Eşâ Mirê, Zeva Hecî Efendi ji Bumsuzê, (xalтия Eşref Erdem û baypîra Levent Kanat e.)
Adula Mirê, ji gundê Bildux ji salên 1950î ev wêne hatiye wergirtin. (ji arşîva L. Kanat)

Qurban

Ferhengek hebe
Dijminatî û kedxwarî
Bindestî zordarî
Tê de tune be

Jîyanek
Azadî û bextewarî
Wekhevî hevparî
Ji herkesekî re be

Yarek
Bejn zirav û tenik
Wek Zîna Botan
Xwûşkeke nav Stî
Hevalekî dilgerm
Wek Tacdîn qehreman

Jîyan çi xwaş dibe
Welatekî azad
Nav Kurdistan
Welatekî ti
Beko tê de neman

Gul û kulîlkên azad
Bixemilînin Agirî û Sîpan
Berfa spî taca serê wan
Jîyanek azad û bi rûmet

Kî nabe qurban

Mem Xetikan

Hezar, du hezar, sê hezar

Ihsan Turkmen

Hezar, du hezar, sê hezar...

Zexê wekî ku bistire, wekî ku bilorîne, wekî ku şîn bike, di ber xwe de her ev sê peyv dubare dikirin:

Hezar, du hezar, sê hezar...

Her ro berî berbangê radibû bavê xwe ji xewê radikir, li ber derî serçavê xwe dişûşt paşê legan û mîsîn dianî dest û rûyê bavê xwe dişûşt, zûha dikir, işlik û şalê wî lêdikir, bi destê wî digirt û dibir li mayênê dida jor. Jê re xurînî hazir dikir û çaya wî dida ber. Diçû ji kadînê bervanga xwe tijî ka û kûşkir dikir, pê argûna li ber malê vêdixist av germ dikir, berê qaw û qecax, paşê kinc û berê xwe û bavê xwe yê qilêr dişûştin. Berî nîvro di destê Mihî bavê xwe re digit, ji sikanê peya dikir, dişande ber camiyê, ba kalan. Şijinga dar dikire destê xwe, berê ser çardaxê ji wir berjêr ber malê rês dikir diavête ser kûlingê. Ji ber xizaniyê tu tereke nedida ber derî, şes mîh û niguna bi tenê jî, ji ber bêteqatbûnê pir erzan firotibûn Eskerê çav zerê ji gundê Teteran.

Her ro di vî halî de bû: Bîstekê di nav malê de çerxdibû, dor û ber top dikir, paşê ji bo bêhnvedanê xwe dida kêleka mîndera bavê xwe ya li mayênê. Herî pir ji vê wextê hez dikir. Dikete nav xewn û xeyalan. Ken li dev, zaroktiya xwe bibîr dianî. Tiliyê wê li ser kilav diçûn û dihatin, -bi keçikên hemsal ve şesik dilîst. Dengê hîqe hîqa wê bû, bi husinê dilê dikenî. Dîsa Kew hatibû bîrê. Bi hevalên xwe ve fêlek anîbûn ser kewa ku çavê wê kor bûn. Şûna avê arav kiribûn meşref. Kewa fiqare ku şûna avê arav vexwarî tu xerawi û nifirê nema jê re dikirin, ew jî lê kêleke malê destekî wan li dev, dikenîn.

Ew bîranînên xweş zû şûna xwe didan ên xirab. Berê birayê wê bi tenê ku ji eskeriyê venegeriyabû di hate bîra wê. Ji xwe xwang û birayekî bi tenê bûn. Husînê birayê wê li Edîrneyê esker bû. Çûyîn ew çûyîn. Gundî cîrana digotin, dilê xwe ketiye keçikeke tirk li wir maye. Hineka digot, revîye, çûye nav bulgara bûye gawir. Hineka digot, ji ber sorbûn

û şerê Mihe li Stenbolê bi cîh bûye, niha pir qelaw bûye. Hineka jî digot, miriye. Zexê bi her şiklê ku gundiya ku li Husîn hevdianîn, ew xeyal dikir. Zex, wekî ku gotinên gundiyan rast bin bi dilekî xemgîn him şâ dibû, him jî şîna wî dikir. Bawer nedikir ku miriye, lê ev ehtîmal jî ji serê xwe nedîavêt. Di nava deh–bîst deqeyê ku xwe dabû erdê de şâ dibû, dikenî, xemgîn dibû, digirî, şîn dikir.

Rewşa Zexê her ro bi vî halî bû. Wextê ku xoce ji bo nimêja nîvro ezan dida, hema di şûna xwe de vediciniqî, mîna ku gere bi lez bigihîje derekê şimikê xwe yê keske çîn çînî bi ser ningê xwe ve dikirin, berê mala Meste ya mîrat û xerawe digirt. Wekî kar û barê wê yê malê, rûniştina wê ya ber mala Mestê jî bi tevger hebû. Bervanka xwe derdixist, li ber teqa çardaxê ya ku bê cam redixist, çarmîrkî li ser rûdinişt û dest bi rituela xwe ya her ro dikir:

Hezar, du hezar, sê hezar...

Dikete nava xewn û xeyalan. Tenê sê peyv bûn: Hezar, du hezar, sê hezar. Sê peyvên ku bi deh deng, her dengek bi wateyeke din, ji devê wê derdiketin. Car cara mîna nalînekê heta heta dirêj, tu yê bê qey bê hemdê wê peyv ji dev dirijîn, li ser sînga wê belavdibûn.

Hezar, du hezar, sê hezar...

Salê wê nêzikî cilî bûn. Her tim xontekî civîtî gulgulî lê bû. Bi ser de işlikekî mîrayî bi moriyêng reng bi reng ku ji kevnbûnê êdî stukûr pê de nemabû, di bin wî de jî kirasekî gewr ku meriv dizane ku berê sipî bûye, lê bû. Di mal de ser qot, gava ji mal derdiket kefiya xwe ya reş dida serê xwe. Biskêñ porê sipî her dem bi ser çavê rastê de berdida. Çavê wê

yê rastê hinek jî yê çepê biçûk nebûya, ne jineke bi mexde bû. Bejn zirav, rû sipî, dev û burî teyê bigota qe hatibûn neqş kirinê. Li cêninga rastê deqeque qilotik bi heft niqteyêng li dor hebû. Ew jî mîna çavê xwe di bin biskê de vedişart. Nezewicî bû. Carekê, dora bîst salî ji meriyekî ji gund ku lawê wî nedibûn, wekî jina diduya hatibû xwestin, carekê jî çar sal berê ji bo kalekî bî. Cara yekê diya wê, nexwest ku keça wê here ser hewiyê, neda. Cara diduya jî, terka bavê xwe nekir. Kê dikarî li vî kalî bêkes xwedî derketibûya. Şûna wê mala bavê bû. Heta mirinê wê di mala bavê xwe de rûniştâ. Xwe bi xwe digot: „Heta nekevîm binê erdê reş, kilid li vî derî naxim“. Bi vêne lê, mîratbûna malbavê dilê wê pir diêşî. Bimiriya Mala Mihî Olke wê mîrat bûya. Mîna mala Mestê. Malbava wê mîna ya Mestê bûya

dîsa jî ne xem bû. Ji heft keçikêن Mestê bûbûn sedûheft kes. Li şûna malbaveke mîrat, heftê malê din çêbûbûn. Gî jî ji hev re bi midare bûn dihatin diçûn. Lê Zex? Kesekî Zexê tune bû, ne bav, ne dê, ne bira, ne ap, ne jî xal. Mala Mestê ya mîrat ji Zexê re bibû star, hewîya wê tenê li wir dihat.

Hezar, du hezar, sê hezar...

Berê gundiyan bi vî halê wê qirfên xwe dikirin, yekcara jî kurikên gund ew kevir dikirin. Lê ne xema wê bû. Li ser çardaxa mala Mestê têkiliya xwe bi dinyayê re qut dibûn, bi xewn û xeyalêن xwe ve dibû yek. Ev salêن dawiyê rûniştina wê ya li ser çardaxê ber çavêن kesî ve xuya nedikir. Hebûn û tunebûna Zexê yek bû. Bûbû perçek ji diwar, na, stu-nekî çardaxê.

Hezar, du hezar, sê...

Bi dengê pezê Mala Reşke ku her tim ji nîvro berê êvarê diçû colê, hate ser xwe û ji nişka ve rabû ser xwe. Mîna ku zarokên wê yên birçî li benda wê bin, bi carekê re bervank da ber xwe û bi gavêن lêz berê xwe da malê.

Deriyê malê her dem li ser piştê bû. Hinekê li dora xwe mîzekir, di ber xwe de kire pilte pilt û çû xwe da ser gelta ser çardaxê.

Dema wê ya herî xirab ev bû. Ji ber êvarê bigre, heta serê sibê, ji dinya xewn û xeyalan derdiket, bi rastiya xwe ve bi tenê dima.

Diya wê bi hesreta Husîn, ji derdê Husîn miribû. Husîn, xweş e ma-la wî ava, miriye şûna wî qatê hefta yê cennetê be. Bavê wê yê ku her dem dest bi ço, def bi zêf berî çar sa-la miribû, bi gotina wê mirar bûbû. Mirarî hê lê dihat. Di korta ku têde de bike zûre zûr, heta mirinê gû ji dev dibaři. Lê qurbana Xwedê me, herdu çavên wî vekirî çû nava heft qatên binê erdê. Heta ramedînê veng di ber xwe de dikire pilte pilt.

Qe nedixwest ku êvar were û tarî bi erdê keve. Ew jina rûnerm diçû, şûna wê Zexa Mihî Olke dihat ku tehbetê wê mîna yê Mihê bû. Ji rewîyê re, ji çûçîka re, ji mêşa re, ji kurik û mezina re, ji her tiştî re şor û nifirêن nema dikirin. Bi dengê ezanê re diçû dikete nava nivînan. Lê bi carekê xew nediket çavan.

Roja dawî ya Mihê dihata ber çava. Danê nîvro, ji xebera bîrva çûbû. Kef bi dev ketibû. Zexa ku her ro ji bo mirina bavê xwe dua dikirî, dilqetî bûbû. Di dora Mihê re çû hat, meze kir ku tişt ji dest nayê, xwe avête mala Omke. Xwadê şikur Omikî li mal bû. Her çiqas jî Omke ji ber Mihe pîst datışand jî,

yeke Zexê nekire dudu. Ereba hespa ya li ber derî bi herdu hespê çê qos kir. Mih avêtine ser geltekê dane riya qezayê. Şûna zêfa ji devê Mihê kef derdiket. Li nîvê rê bi inte intekê piçek bi xwe de hat. Ji aliyekî da kef ji aliyekî de jî „Huuus... Huussîn... Huuusînê min“ bi zorê ji dev derdiketin. Bi vê rewşê riya sê saeta di bin kele kela havînê de Mih gîhandina nexweşxana qezayê. Du xortên li ber deriyê nexweşxanê cixare dikişandî –ku di her halê wan re kifş bu “xebatkar” e newxeşxanê ne, vê dil rabûn ser xwe gotin: „Eminin niyi var?“ „Niyi var“ pirseke rast e, lê ka bersiv? Omike xwe komê ser hev kir, çend peyv ji tırkıya ku pirr kêm dizanê da ser hev û got: „Le gormiyor, a¢zında kef!“. Ji xebatkarê nexweşxanê yê bi simbêl çû rahişte sedyeyê Mih avêtin ser birin dane ber deriyê Doktor. Çend deqa şûnda doktor derket, bi çavekê nizm li Omke û Zexê mîzekir, go: “Ne var, hastanın neyi var?” (nexweşıya wê çi ye?) Di wê navberê de xebatkar xwe gihande hawara wan û go: „A¢zından kopük geliyor efendim“ (kef û kinc ji dev tê.) Doktor bê dil destê xwe avêta zendê Mihê ku hem hema bê can mayî, „Daha yaşıyor“ (hîn dijî) got bi avirên „bimraya baştir bû“. „Röntgen ve kan tahlil-

lerini çıkarıp tekrar getirin“ (bidin rontgenê û analîza xwîna wî bînin) got, berî ku derî li ser xwe bigre. Di nava saetekê de rontgen kişandin û tehlîla xwîna Mihe kirin, dîsa birin ber deriyê doktor. Xebatkar bi rêz li derî xist û encam dirêjî doktor kîrin. Doktor bîstekî kete hundir, li derketinê: „Ben burada birşey görmüyorum, hastayı daha büyük bir hastaneye götürmeniz gerekiyor (ez li vir tiştek nabînim nexweş bibin nexweşxaneyeke mezin.)

Di gotinan gîşka jî negîhîştibe jî Omke fehmkir rewşa Mihê ne baş e û gerek wî bibin Konyayê. Lê çawa, bi çi, pi kîjan pera?

Dermaneke da wan û got bikin nav avê û bidine nexweş. Omke hew girtin, bi çavekê xerîb lê mîze kir û wekî ku ji derê xwe bike, kire nav destê Zexê.

Danê êvarê tî û birçî li erebê sîyar bûn li paşiyê Mihê bê mecal dane rîya gund. Bi rê de destê Zexê li ber devê wê, li Mihê mîze dikir. Weng lê mîze dikir ku meriva ne dizanî çi hîs dikir. Ma bimre yan ma bijî? Ne dizanî jê hez bike yan jê bîqehire.

Dereng dereng xwe gihadine Kaniya Hemî Bêze. A Xwedê hîveron bû ku ber xwe didîtin. Heryekî du qult ji ava sar vexvarin. Zexê bi çengê xwe xwast qultek av bide

Mihê lê bê fêde. Mih mîna miriya bû. Omke hesp vekirin berê avda, paşê berda mîrga dor kaniyê û hante xwe da ba Zexê. Zexê heta kaniyê, riya du saeta qe devê xwe venekir û tiştek ji Omike pirsnekiri bû.

„Zexê doktor dibê derek em Mihe bibin Konyayê. Lê ne wesayîtê me he-ne ne jî pere. Doktor got hezar qaymî (lîra) em ji bo mesrefê nexweşxanê bibînin. Ha me wesayit di em çûnî Konyayê, emê pera ji ku derê bînin. Lê bê fêde, dengkirina wî xwe bi xwe re bû. Zexê her wekî dest li dev, tu şor nedikirin. Ne „erê“ ne „na“. Omik jî neçû ser. Rabû hesp anîn qoşe erebê kirin, ber bi gund çûn.

Ewqasî saetekê bi rê de çûn û gîhiştin neqewa gund ku hemû gund xuya dike. Tek-tûk roniya çîrên ma-la di caman re didan derva. Omke hesp dane dawistandinê, hebkî ji erebê dûr ket, pêçek bi şun ve dîsa ve-gerî. Xuya bû ku mîza xwe kiri bû. Hat di ser erebê re li Mihê mêze kir û bi mîzékirinê ve guman kete dilê wî. Nebe ku Mih mirî be. Destê xwe da eniya wî û qîrinî pê ket. „Malneketê le merkî mirî, tuyê li ber çi yî. Ci baw eynî jî keçik. Tobe to-be. Meriya dikine guneha“. Nexwast ku pir deng bike. Bê fêde bû.

Eniya Mihê sar bûbû, êdî tu deng jî jê dernetiketin. Mihê ku li kêleka

dev kefeke zûha bûyî, bi çavêv ve-kirî êdî ne li ba wan bû.

Omkî weng bi hêrs bû, teyê bi-gota, ewê biteqe. Lê qe dengê xwe nekir, hevsarê hespa kirin destê xwe, bi rê ket. Bi birêketina erebê ve tev-hev ji devê Zexê bi dengekî nizm ew sê peyvîn ku di jiyana wê de cîhekî girîng bigrin, derketin:

Hezar, du hezar, sê hezar...

Her çiqas ji Mihê aciz bûya jî miri-na wî li Zexê pir bi qar hat. Rind-xeraw tenê bavê wî ma bû. Wî jî bê deng, di destê wê de can dabû. Ji bo wî tu sînê mezin çênebû, kesek ne girî, ne jî bi xwe de ket. Bê deng rakirin birin û çal kirin. Ji çend cîran, xoçeyê gund û Omikê ku heta nîvro xwe da bûn ba Zexê, kesekî din ne-hat sersaxiya Zexê. Kesekî jî careke din, li deriyê mala bavê Zexê nexist. Zex, li mala bavê, bi xewn û xeyalêñ ve tenê ma bû. Na, ne bi tenê. Jana jiyana wê her sibê dihate ba wî. Bi nimê sibê ve radikir, dest serçavê wî dişûst, kincen wî lê dikir, xurîniya wî hazır dikir, paşê dişande nav he-valan. Ji Mihê mirî ne lê jî vî Mihî pir hez dikir. Di xeyalê xwe de ji xwe re bavek çêkirî bû. Mihê dilê wê bû. Bê deng û kamil.

Hezar, du hezar, sê hezar...

Xewn

Seyfi Doğan

Ez ji xewê rabûm ku ez û di xuyê da reş bûme. Xewna min ê giran bû. Ez û li çolekê bûm. Li eşqa xwe digerîm. Ba û bahoz dest pêkir û min rîya xwe şaş kir.

Min kir û nekir, min rê nebira ser rîya xwe. Germa colê rojê diqilijînê.

Demekê geriyam bi şun da bedena min tê bê maran mîti bû. Tî bûm û li avê geriyam.

Berve cîhê ku axê qumê û tîrêjên rojê sor û heşin hevdu maç dikirin, meşiyam.

Kervan radibirtin. Dengî zengilên hêştirayî monoton, quma çolê serhoş dikirin.

Li şevêñ çolê, min tenê qumê ku ji sermê dicirifîn, dîtin. Min li ezmên hêstirkên sor û bûrûskên sipî yên ku ewr dixemilandin, dîtin.

Min li dûrê qeraltiyêk dît û meşiyam wî alî. Herkî ku ez nezîkî qeraltiyê dibûm, qeralti ji min bi dûr diket. Ez demekê wîsa meşiyam.

Roj hate nîvro. Germê çolê û axê qûmê, ez gelek westandim.

Ez nezîkî qeraltiyê bûm ku merîyekî por zer û çav heşinî li sîyê darakê runiştîyê. Min silav dayê û xwe

da benda destura wî ku li sîyê darê rûnim.

Mêrik xwe ji wan deran nekir.

Wexta ku min baş li doralîyê mîrik temaşa kir, min dît ku di bin kursiyê ku merîk li ser runiştî da marakî dirêj û belek-belekî xwe nure serhevdi kiriye.

Mêrik bi zimanî xewnan pirskir.

–tî yî, newang e?

–erê

–baş e.

Mêrik bîra avê nişan min da lê ez nezikî bîrê nekirim.

Mêrik bi pêçiyê xwe, bin kursiyê ku li ser runiştî nîşan da û bi zimanî bedenê xwe got; lêmëske!

Mêr, devê xwe vekirî bû. Hundirî dev wek qatranê reş bû.

Eger ku te musade kir ku ew mara zimanî te maç ke, ez ê destûr bidim ku tu bi hemdî xwe avê vexwî.

Ez gavakê fikirîm bi şunda min got: temam.

Mêrik, bange mîr kir û mar, bi lez ber ve min, xwe xûş kir. Ez bi çokan ketime erdê û devê xwe li ber mîr ve kir û zimanê xwe dirêjê kir.

Mêr, demakê, zimanî xwe yî çetel ba kir û çavêñ xwe berdan hundirî

cavêن min û didanêن xwe yên pîjik û hedî û hedî di zimanî min re kir û bi keyfekî nefes hilda.

Mér karê xwe bikarşînasîyêkê wisa kir ku ez mat bûm.

Ez, demek çû bi şunda gêjbûm û zimanê min dest bi werimandine kir. Zimanê min qulot dibû û muyê ser zimanê min hundirê devî min didi-randin.

Zimanê min zêde û zêde diwerimî. Min bi zehmet nefes hildida. Herkî diçû, nefes hildana min gelek zor dibû. Min xîza û xîz bû.

Çavêن min li serî min bûn yek hot. Min edî nefes hilnedida. Berî ku ez vetisêm hestîyê serî min teqî û mejoyê min li her dere çolê belav bû.

Mêrik, bi mîr mejoyê min berhev-kir û da ber rojê ziwa kir.



1953- Mistefayê Mirê(yê bi fotêr) apê Levent Kanat e. Di sala 1959an de miriye.

Ev wênc li zozana Malê Mirê (gündê Bildux) hatiye kışandin.

Yên serê pêz girtine; Hana Malê Palo û Rehma Mistefê

(ji arşîva L. Kanat)

Cara yekemîn ez li Kurdistanê bûm

Muzaffer Özgür

Rojeka havînê li ber sîya dûwarê mala me, civatê li ser koçberiya eşîra me sohbet dikir. Ji civata gundê me çend kesan agahdariyên xwe li ser dîroka eşîra me hebûn, şor digirtin. Kesên hebûn jî ew bûn; Hemkê Musê, Miçke Çevûş, Mehmede Hecî Ranê, Absefê Hecî Şehlî, Omikê Absef, Kadirê Mamikê, Hesikê mala Hec Ehmed, Remazanê Goçmên, Seyîdê Mala Şehlî, Bekirê Hemkî Musê, Bavê min Bekirê Hesenko û xalê min Ehmedê Milhûsîn. Di nav wan de xalê min civan bû.

Mezinê civatê, Hemkê Musê şor digirt û pirsên jê hatin pirskirin, bersivandin. Carcaran jî apê Miç şor digirt û sohbet di nav gellek pirs û bersivan de berdevam dikir. Rastiyên dîrokê, xeyalên mezinên me û daxwazen wan tev û hev dibûn.

Demekê li ser we mijarê gellek gotin hatin ziman. Gellek pirs hatin kirin û bersivên wan jî hat dayîn. Min jî him xizmeta wan dikir him jî bi gotinên wan dîroka eşîra xwe dievîsim. Xalê min bi ereba xwe gellek caran çûbû welatê jêr. Dema behsa İslahiyê dibû, xalê min şor digirt û rewşa wan deran jî civatê re eşkere

dikir. Agahdarî didan. Dema civat belavbû agirekî har ketê dilê min. Xalê min xatirê xwe xwast û got;

– Min erabe barkiriye, li ber mala me ye. Ez sibê terim Îraqê. Min bi heyecaneka mezin got;

– Xalo, ez jî bi te re herim, hîn jî dibistanê re sê heftê hene, li gund jî tu karî nakim, eger tu bejî erê, ez bi te re herim İslahiyê, cem merivên me. Xalê min got;

– Erê, di be. Li vegerê jî em ê tevûhev werin mal.

Ez çûm hûndirê malê, min bi diya xwe re daxwaza xwe eşkere kir. Dê û bavê min destpêke erê nekirin ji çûyîna min re, lê li dawiyê qebûlkirin. Min xwe amedekir. Nav, navnîşan, navê gundê merivên me yên li welat û agahdariyên bi min gereg bûn, hemû bavê min dan min. Min li kaxizekê hemû nivîsandin. Heyecaneka mezin bi min girtibû. Xew nekete çavên min.

Sibê zû da em ji gund derketin, çûn merkeza Konyayê. Mala xalê min li wir bû. Çend roja me li wir kemasiyên xwe xelaskirin. Ji ber pirsa tendûrîstiya xwe, xalê min Ehmed nekanî bi me re were. Me

ew li bajarê Konya cihîst û ez û xalê min î Hûso, em derketin ser rêya Kurdîstanê.

Barê me ji Sembûlê diçû Kerkûkê. Rêya me dirêj bû. Meha ilonê bû û leşkeran dest dabû ser dewletê. Ji bo wê jî li ser rêya me gellek leşker hebûn û kontrol gellekî zêde bû. Bi rê da çend hevalên din jî ketin dû me. Me li çiyayê torosa, li zozana tekîrê bîhna xwe girt, xarineka gellek xas xwar. Em li dawiyê carek din ketin rê. Min ji xalê Hûso pirsî;

—Cîhê çiyayên Torosê ya li ser rêya me ya pirr bilind kudere? wî got;

—Em ê niha li jor, li Gavirdaxê (çiyayê gavira) bin, ez ê bi te ra bibêm.

Demeke bi şûn da em li wir bûn. Min got;

Eger tu bikanî bisekinî, çend deqa bisekine. Xale min got;

—Çima? Eger tu bixwazî em ê li cîhê potrolê, li jér bisekinin. Min got;

—Na, ez dixwazim tu li wir bisekinî! Ez ê ji erebê peyabim.

Xalê min ecep mabû, le sekinî. Sêra min dikir. Ez ji TIRê peya bûm. Çend metro ji erebê bi dûr ketim Û min destêن xwe berjor rakin. Bayekî germ ji Kurdîstanê dihat. Serçav û rûyê meriv dişevitandin. Ez

li ser sînorê Kurdîstanê bûm. Gellek kêfa min jî hat. Ez bi çokan ketim erdê û min erd maç kir. Min di ber xweda got;

—“*Bijî Kurdistan,*

Bijî Azadî, bimre koletî!“

Xalê min eceb mabû û ji min tiştek fêhm nekiribû. Dema ez li erebê siyar bûm, bi min re got;

—Ew ci bû, te destê xwe berjor kîrin, te dûa kîrin? Min got;

—Erê!

Em dîsa derketin rê. Xalê min bi min re dûrûdirej behsa İslâmî kir. Min qet deng nekir û guh dida wî. Lê edî em li ser erdê welatê kalûpîrên xwe bûn. Di serê min da gellek pirs û heyecaneka mezin hebû. Em derketibûn serê çiyayên Torosa û niha jî serberjêr dadiketin. Xalê min got;

—Eger otobûsek bê, ez ê işmar kim yê bisekine û tu yê pê re herî Türkoğlu an jî Meraşê.“

Demekê bi şûnda otobûsek sekinî û min xatirê xwe ji xalê xwe xwest û ez siyarê bûm. Xalê min li paş min ma bû.

Ez bi otobûsê heta bajarka Türkoğluyê çûm. Dema ez ji otobûsê peya bûm, dev deva evarê bû. Roj diçû ava. Min li cîhekî xwaringehê xwarina xwe xwar. Xadanê dûkanê jî kurd bû. Min ji xadanê dûkanê pirsî ka ez ê çawa herim

gundê Karahöyüka Kûlxêş. Me li ser merivên me û gundê wan sohbet kir. Wî got:

—Bisekine, rêya gundan têne kum kirin. Niha kamyonêن kumê dibin wir ê werin, ez ê te teslimî wan bikim. Ew ê te bibin cem merivên te.

Demekê bi şûn da kamyoneka barê xwe kum hat û du xort jê peya bûn. Xadanê xwaringehê çû bi wan re dengkir ka ew ê bikanin min bibin an na. Ew hatin cem min û me ji bo çûyînê deng kir. Kabûl kirin ku ez ê bi wan re herim gundê merivên xwe. Em bi hev re li ereba wan siyar-bûn û şoferê me kete rê.

Li ser rêya me gellek însan hebûn. Gundî û karker, ji terleyên pembû vedigerîyan mal an jî konên xwe. Li ser rêmorkên trektoran gellek kes hebûn û piraniya wan jî, jin bûn. Em demekê çûn. Ez di navbera wan de rûniştibûm. Bi rê de xor-tan gellek pirs ji min kirin. Kîmê? Ji Konyayê çawa merivên min li wan deran hene? Ma kurd li Konyayê he-ne? Û gellek pirsen din. Min qesî dizanî bersiva wan dida. Yekî ji aliyê rastê yê din jî ji aliyê çepê, ez dabûm ber şora. Ew jî kurd bûn. Lê me bi tirkî deng dikir. Ji wan yekî got:

—Gundê merivên te gundekî pîs û xerab e, hemû bênenmûs in, ew dûjminê me ne!

Ye din jî got;

—Ma tu jî sunnî yî? Min got;

—Erê, ez jî sûnnî me, lê çi ferq heye di navbera însanan de? Ma hûn çi ne? Yekî got;

—Em Elevî ne. Min pirsî;

—Lê ma hûn ne kurd in? Yekî din got;

—Erê, em jî kurd in. Lê em elevî ne. Ye din;

—Tirkên sûnnî û dewleta wan û kurdên me yên sûnnî, yên li wir, ne baş in. Wan dest dan hev û qetliyama me kirin. Pirr kes hatin kuştin li Meraşê! Ma tu nizanî?

Min qetliyama Meraşêbihistibû lê li ser wêe pirr agahdariyên min tunebûn. Ma kurdên wek merivên min çima di navda cîh girtibûn, min fehm nedikir. Gereg min ew pirsa ji wan bikira.

Bi rê de wan xwarina xwe ya nanê kilor û pîvaz xwarin û li dawiyê jî zebeşê xwe bi kerê birîn. Alîyek zebeş jî xwastin bidin min. Lê li ser gotina wan ez pirr xemgîn bûbûm. Min nexwar û spasiya wan kir.

Êdi bajaroka Türkoğlu li paş me ma bû. Rîya em li ser bûn dihat nûkirin ji bo wê jî rê tengbû û ereba me giran diçû. Çavêن min li remorkên tijî însan bûn. Gellek însan vedigerîyan û berva bajaroka Türkoğlu diçûn. Romanêن Yaşar

Kemal dihatin bîra min. Li deşta wir karê pembû gellek bû. Dema min ew difikirî bi gotina yekî hatim xwe; –Nufus cuzdanê xwe bide min.

Min bi tirs li çavêن wan meze kir û ji berîka xwe nufus cuzdanê xwe derxist da wî. Wî kesî lê mîze kir, nufus cuzdanê min derxist hemû bi dengekî bilind xwand: Muzaffer Özgür, islam, Konya, Kulu, û cuzdanê min kirê berika xwe. Ez edî tîrsiya bûm. Wan heneke xwe dikirin an daxwaz dikirin tiştekî bî-nin serê min!

Min di dilê xwe de dixwest û dua dikirin ku ma tiştek bê serê ereba wan, em peyabin û ez birevim. Em bîsteke din çûn. Wan edî hequeret bi min dikirin û yekî jî çend caran bi mista xwe li min xist û got; Muzaffer Özgür, sînnî. Şoferê me bi hevalê xwe re got;

–Cuzdanê wî disa le vegerîne, eger tiştek bibe ew dibe delîl! Ma tu dîn î, ci bikî bi perên wî, ew jî ne pirr in.

Ye din nedixwast, lê li ser wan gotinan cûzdanê min ji berîka xwe derxist û mistek li gepira min xist û da min. Min ew girt û kir berîka xwe. Edî ez kelegîri bibûm, lê bêçare bûm. Cara yekem bû ku li Kurdîstanê bûm, li warê kalûpîrê xwe bûm, lê di bin destê du serse-

riyan da mabûm. Bi min hequeret dikirin.

Ro êdi di paş çiya da bû û dûrêdûr çirêن gundan xûya dikirin. Min di dilê xwe de digot; „Yezdanê mezin, ez di bin destê kurdê me yên Kurdistanê de me. Ew ci derd û bêçareyi ye. Ez ê çawa ji bin destê wan xelasbim, alîkarîya min bike.“ Ez yek ji wan bûm. Sempatiyeka min a mezin ji siyaseta kurdî re hebû. Lê ew ci bû? Pirsa kurdî hebû, lê niha jî li wan deran sînnîtî-elevîtî jî heye? Min ew pirr nebihîstibû û tu agahdariyên min jî tunebûn.

Ji nûşkava dengekî mezin, teqiniyek, ji ereba me hat. Dilê min kire gurpe-gurp.

Şoferê me sekînî û destêن xwe li serê xwe xistin, got;

–Off... tekere me tekiya!

Yezdanê mezin duayêن min kabûl kiribûn. Em ji erebê peya bûn. Tekera paşiyê tekî bû. Çavêن min li ser rê, li traktora bûn. Ew fersetâ revê bû. Ji hemberî me jî yek dihat. Min xwe amade kir ku dema traktor hat nezikî me be, ezê bazdim û siyâre bim.

Xortêن me jî ketibûn derdê tekera xwe. Min bi dizikî çentê xwe ji ereba wan derxist û da paş xwe. Çend metro dûrî wan li ser kuma li keleka rê rûniştîm. Dema traktor hat

gehişte me, ez beziyam û bi alikarı-
ya jinê li ser remorkê siyarê bûm.
Xortekî da du min lê dereng ma bû.
Bêçarê vegerî çû.

Min spasiya xwe ji jina re kir. Ez
gellek xemgîn bibûm. Çavêن min ti-
jî bûn. Hêstirkên min daketin û ser-
çavêن min şîl bûn.

Jinepirêk hat cem min, got;

—Çir bû lavê min? Min bi deng-
kirina wê re fêhm kir ku ew kar-
kerên jin hemû kurd in. Ez li ber
çokên jinepîrê rûniştim wê jî destê
xwe avête serê min wek dayika min,
serê min mista. Ez gellek giriyam.
Ew hemû di bin şokê da mabûn. Ez
kî bûm? Ci hatibû serê min, meraq
dikirin! Ava xwe dan min. Min bi ji-
nepîrê re bi kurdî sohbet kir. Ez ha-
tim xwe. Xelas bûbûm û şoka min jî
derbas bibû.

Demekê bi şûn da ez li bajeroka
Türkoğlu bûm. Edi şev bû, li wir otel
jî tûnebû. Heta sibê li ser sendalyekê,
li ber deriyê lokantekê rûniştim. Di
vê navberê de çend leşker hatin cem
min, nufusa min kontrol kirin û ji
min pirsîn ku ez li wir ci dikime?
Min agahî li ser rîvitiya xwe dan
wan. Yek ji wan jî ji Konyayê bû.
Ez ji bo rewşa awerte agahdar kirim
û çûn. Dev deva sibê jî bi otobûsekî
çûm Meraşê û ji wir jî bi ereba gund
çûm gundê merivêن xwe.

Dema ez gêhiştim mala
Heci Hasan Safsöz, ya li gundê
Karahojuşa Kulxêş û min xwe da
nasandin di nav malbatê de şîneka
mezin çebû. Xortekî 16 salî ji deşta
Heymanê hatibû ziyareta wan û wan
hevûdu nasnedikirin. Mezinê malê
û merivêن min dema dihatin di ser
min da digiriyan, şîn dikirin. Bîhna
dîrokê ji mezina dihat.

Çend roja bi şûn da min, heka-
ta hatî serê min ji wan re eşkere kir.
Ji ber nexwaşıya rîvitiyê, min nedî-
kanî bi merivêن xwe re sohbet biki-
ra. Dema min ji wan re hekata xwe
eşkere kir, çend xortan sîlehêن xwe
anîn, ereba xwe amade kirin û go-
tin min;

—De ha, dê em herin rê. Plaka
wê erebê bi de me, an jî wan kesan
îşmarî me bike. Em herin wan bigi-
rin, heqê wan jî bidinê!

Lê min daxwaza wan nekir. Her
roj dipirsîn, min jî her roj ew red di-
kirin. Ez demaka dirêj li welêt mam.
Min wextek baş bi merivêن xwe yêñ
li Kurdistanê dijîn re derbas kir.
Bi gellek agahiyêن li ser qetliyama
Meraşê hîn bûm. Gundê eleviyêن
me geriyam. Bi mezinê gundan re
gellek sohbet kirin. Li gundê pîrû-
kalê xwe, li ser koçberiya eşîra me jî
gellek agahdarî girtin...

Piştî 600 salan Şêxbizêniyên bakur û başûrê Kurdistanê bi hev şâ dîbin^(*)



Daxwaza derxistinayasayekê dîkin da vegerin Kerkûkê

Hemîn Xoşnaw

Piştî derbasbûna dora 600 salan di ser parçekirina wan re, Şêxbizêniyên Herêma Kurdistanê û Tirkîyê bi hev şâ dîbin û siberoja êla xwe guftûgo dîkin. Nivîskarekî girêdayî wê eşîrê jî dibêje ji hikûmeta Herêma Kurdistanê daxwaz kiriye riyeke yasayı bibîne da ku Şêxbizêniyên Tirkîyê vejerin Başûrê Kurdistanê û li bajarê Kerkûkê, ku navenda serekî ya wê eşîrê bûye, bêñ niştecîkirin.

Êla Şêx Bizêni, li çend navçeyên Kurdistanê, nemaze jî li bajarê Kerkûkê hene. Lê beşekî mezin yê vê êlê li Anadola Navîn li navçeya Haymane ku 65 km jî başûr rojavayê Enqere dûr e, dijîn. Hemû çavkanî li ser wê yekê li hev dîkin ku Şêxbizêniyên Heymanê di navbera salên 1400–1500 di serdemâ desthilata Yavuz Sultan Selîmê Osmanî de, hatine sirgûnkirin. Lê derbarê ku bi kotebkî hatine koçberkirin

* Ev nîvîs ji rojnama Rûdawê hatiye wergirtin.

yan bi keyfa xwe bûye şirove û xwendinêن cuda hene.

“Koçkirina wan keyfi bû”

Bi baweriya Emrulla Suslî ku kurdekkî şêxbizênî yê Heymanê ye û kurdî dizane, koçkirina şêxbizêniyan di destpêkê de ji navçeya Çemçemal ji bo Cizîre û Amed û pişt re jî ji bo navçeya Palo keyfî bû û ji ber pêwendiyêن wan yên xurt bi sultanê Osmanî re bû: “Li gor lêkolîn û gotinêن mezinêن me, diyar e Şêx Bazyan ku bapîrê mezin yên şêxbizêniyan e di serdema şerê Sefewî–Osmaniyan de piştgiriya Osmaniyan kiriye. Piştî xilasbûna şer ji ber nêzîkiya navçeya wan li jêr desthilata Sefewî rastî pirs-girêkan hatine, lewma Sultan Yavuz wan vediguhêze navçeya Cizîre û Amed, pişt re jî diçin navçeya Palo.”

Emrulla dibêje dokumêntên dîrokî hene îspat dikin Sultan Evdilhemîdê duyem şêxbizênî ji bac û xizmeta leşkerî efû kirine: “Piştî ku dora 50 salan Şêxbizênî li navçeya Cizîre û bakurê Kurdistanê dimînin, vê carê koçî devera Palo dikin. Lê ji ber asêbûna wê deverê û bikêr nehatina wê ji bo xwedîkirina dewar û lawiran, vê carê berê xwe didin Anadola Navîn û Heymanê ku 65 km ji başûr rojavayê Enqere dûr e. Fermaneke Sultan Evdilhemîdê

duyem li ber destê min e ku ferma-na efûkirina şêxbizêniyan ji bac û xizmeta leşkerî daye û herwiha fer-man daye ew azad in li ku derê bijîn û vehewin.”

Li gor belgeyên dîrokî Heymane û Anadola Navîn navenda vehewîn û niştecîbûna ermeniyan bû. Lewma bi destpêkirina qirkirin û derxistîna ermeniyan re, Osmaniyan li hin deveran kurd xistin dewsa wan de. Suslî got: “Wek bapîrêne me vedi-bêjin gava me di derdora sala 1750 de koçî Heymanê kiriye hê jî hinek ermenî li wê deverê hebûne. Dîsa îro çend paşmayêن ermeniyan li wir he-ne. Ew dever cihê niştecîbûna erme-niyan bû.”

“Hatine koçberkirin”

Lê bi baweriya pêşmergeyê kevin û endamê berê yê parlamentoya Iraqê Mela Şaxî ku ji eşîra şêxbizênî ye û dîroka eşîra xwe lêkolîn kiriye, şêxbizênî bi kotekî hatine koçkirin û armanca wê jî nehiştina Kurdistanîbûna Kerkûkê bû.

Zarokên wan bi zaravê

Lorî dipeyvin

Mela Şaxî got: “Şêxbizêniyên ku li devera Heymanê hatine bicîhkîrin, bi zorê ji Kerkûkê ji bo wir hatine veguhastin û bi destpêkirina pro-

seya qirkirina ermeniyan re li wir hatine bicikkirin. Pêşî ji bo Keleka Asîn Axa û Kewrgosk têr veguhastin. Hinek ji wan xwe ji leşkerên Osmanî vedişerîn û li wir dimînin. Îro çend gundêن şêxbizêniyan li ser Zêya Mezin û navçeya Beranetî û devera Zaxo hene. Paşmaya wan kesan e, ku xwe ji karwanê koçberkiran na şêxbizêniyan veşartine.”

Digel ku şêxbizêniyên Heymanê ji Kurdistanê dûr in û ji xwendîna kurdî bêpar in, lê Emrulla dibêje heya wê dema ku zarok diçin ber xwendinê bi zaravê Lorî `kelhuri` dipeyvin: “Îro şêxbizêni kurdbûna xwe încar nakin. Hemû zarokên me berî ku herin ber xwendinê bi kurdî dipeyvin. Piştî ku diçin dibistanê proseya helandin û tirkbûnê dest pê dike.”

Li şêxbizêniyên başûrê Kurdistanê digere

Derbarê hevnaşîna şêxbizêniyên bakur û başûrê Kurdistanê, Emrulla Suslî ku bi gotina wî yekemîn şêxbizêniye Tirkiyê ye ku pêwendiyê bi şêxbizêniyên Herêma Kurdistanê re dike, dibêje: “Bi bilindbûna asta şiyarbûna neteweyî li bakur û pêşketinên Herêma Kurdistanê re pirsyarên em kî ne? Ji ber çi em hatine koçberkirin? Kê em sirgûn kiri-ne? li ba min dirust bûn. Ji bo ber-

sivdana van pirsyan di sala 2006an de hatim Herêma Kurdistanê. Piştî çend caran ji hatina xwe, min çend rewşenbîrên şêxbizêni nas kirin. Zimanê şêxbizêniyên Tirkiyê zêde li zimanê navçeya Xaneqîn diçe. Li vir gundên Xurxur û Qaya Başî hene li Heymanê ji bi heman awayî du gundêni bi van navan hene. Di encama civîna me bi Şêxbizêniyên Herêma Kurdistanê re me karekî pir cidî kiriye û di siberojeke nêzîk de dezgehek yan lêvegerekê ji bo eşîra xwe radigihînin.”

Dr. Reşîd Mehîmûd Yûsiv Şêx Bizêni, ku mamosteyê zanîngeha Mûsilê ye dibêje; Şêxbizêni bi kotevê ji bo Tirkiyê hatine koçberkirin û îro li 7 deverên cuda yên bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dijîn: “Mezintirîn cihê niştecîbûna şêxbizêniyan li Tirkiyê navçeya Heymanê ye ku nêzîka 45 gundan li xwe digire. Di navbera Qamişlo û Heseke de 6 gundên şêxbizêniyan hene.” Dr. Reşîd got: jî belgeyeke serdema Osmanî li ba wî heye ku sirgûnkirina şêxbizêniyên Iraqê û bicikkirina wan li Tirkiyê teqez dike.


Yasayek ji bo vegera wan

Reşîd Şêx Bizêni, ku tevî civîneke di navbera şêxbizêniyên bakur û başûrê Kurdistanê de li Hewlêrê bûye, di-

bêje: "Di civîna me ya Hewlêrê de, me pêşniyar kir civateke bilind ya wê eşîrê ji bo guhdana bo karûbarên eşîrê bê pêkanîn. Di demeke bê de ew civat tê damezrandin."

Lê Mela Saxî ji bo siberoja eşîra xwe nêrîneke din pêşkêş dike û dibêje; pêşniyarek daye hikûmeta Herêma Kurdistanê: "Min pêşniyar kir riyeke yasayî bibînin ji bo Şêxbizêniyên Tirkîyê, yên ku dix-

wazin vegerin Herêma Kurdistanê û li Kerkükê bênci bicihkîrin. Çiku koçkirina wan ji bo nehiştina nasnameya Kurdistanî ya Kerkükê bû. Bi hejmareke zêde ya Şêxbizêniyên Heymanê re peyvîme, ku hinek ji wan sermayedar in û amadebûna xwe ji bo vegere nîşan dan. Em li wê yekê jî fikirîn wek êla Caf festîvala şêxbizêniyan saz bikin."



26-12-1936

Ji çepê: Osmanê Heci Şîx,
Millê Bekê û Ehmedê Ûviş
ji gundê Bildux.
Ji van Ehmedê Ûviş (Av Ahmet
Fevzi) 1944an de li Faqulta
Anqerê mezun mezun bûye.

(ji arşîva L. Kanat)

*Tayek Por

Rohat Miran,

Birçiyê zimanê xwe, birçiyê xwendin û bihîstina devokê xwe bûme. Dikarim bêjim, bi her peyva ku min ji “Tayek Por” xwendî re, ez bêhilm û bênefes çûm warê xwe, çûm gundê xwe, çûm zaroktiya xwe, çûm ba dengê kalanê xwe û li wir bi şanazî û bi coşekê di nav bihûriya xwe de gerîm.

Bi “Reva Meyro û Mendo”, bi “Nîvro hebis bo Hemo”, bi “Mîya stewr û şivan”, bi “Bedelê kên”, bi “Baberdan û xewnek”, bi “Rojek ji jiyîniya dînê gund”, bi “Ûsivê Mihecîr”, bi “Guregura şeva berî ìnê”, bi “Dilên şikesti”, bi “Bêtar”, bi “Tayek por”, bi “Merive pak”, bi “Motir”, bi “Sirra Hemê”, bi “Rûkeniya parseg” û bi “Paça pêşî” re peyv bi peyv, hevok bi hevok û tâhm bi tâhm gerîyam.

Te gotin ku ger nivîskarek bikanibe xwendîwanen xwe bixwe re bibe gera xweyî ji peyvan pijirî, wê demê ew berhema wî biser dikeve, serkeftî dibe...

“Tayek por”, bi zarawayê me ye, zarawayê Kurdên Tirkîya Navîn, zarawayê Reşîyan û yê jibîrkirîyan e. Çîrokên zarawayê me ye, ji me ye, ji peyvên qedexe ye, ji peyvên ku bûne sedema kut xwarin û lêdanî, ji axa “Bozkirê”, ji navênu ku êdin kevn bûyi, ên ku bi mirîyan re binax bûyi û nema bi kar dihatî, ji wan qawûqacaxan, ji puşqil û rixan û ji havîr û dew bûn û niha ew hemû bihev ra ketibûn nav edebiyatê, ketibûn nav rastî û afirandinê, ji nav xewnan fetili bûn û rih didan rûpelên heremî û ez zîz dikirim.

Carna çavên min şîl dikirin û carna jî bi henekan kenîm, şâ kirim.

Bi vê kitêbê, min kurteçîrokên brêz li du hev xwendin. Careka din xuyabû ku brêz Ateş, viqasî çîrokên xweyî bi xem, ji heqê çîrokên bi ken jî, ên bi yaranîya, ên bi henekan jî derdiket.

Pirr caran min çîrokên rastinî tê de dîtin, her şexsîyetê ku min xwendî, wek yekî ji nasêñ min

*Tayek Por. Nuh Ateş. Weşanên Apec, 2012, Swêd

bû. Di jîyana min de jî yekoyek yekî wiha hebû. Di hundirê “Üsivî Mihecir” de, “Elî Axa”, li gundê me, “Mil Elî” bû û bi rastî jî sisê jinêñ wî hebûn û axayê gund bû. Di “Motirê” de, “Hec Bekîr”, li gundê me “Hec Heyder” bû û hwd.

Di nav “Tayek Por” de jî, raste êşa dêya xwe hatim. Dêya minî ku niha ji zûve bûbû parek ji xwelîyê.

Bi “Xewna Cino” werqîlîm û dilê min bi qedera Cino şewitî. Pirr giran bû, lê brêz Nuh dawî bi dilxweşiyê giredida.

Tenê min dînê gund, Kino nasnekir, sewa ku gundî me, ti dînên wek wî “intelligent” tunnebûn. Bi gotina Kino ya ku wî ji sofî re gotibû, ez bi kên bihecîm. Çîrok pirr giran, nerim nerim pêşve diçû, mîrov nedizanî dê çiye biqewim e, ew dînê dînan çîma ketibû nav rûpelan? Lê di dawîyê de derket ku, dînê me ew-qes jî ne dîn bûye. Armanca heyata wî, çûyîn û hatina wî hebûye. Him jî armanceka ku qet nedihatê bîra biaqilan. Min ji wî dînî pirr hezkir. Dikarim bêjîm, kitêba kurteçîrokan bi wê bû taca serî min.

Li vir pêwîst e bi mînakekî qala stîla bavê çîrokan, brêz Nuh Ateş bikim. Li alîye me listîkek heye, li nav me ji wî re dibêjin “qamçî”, ji alîya mîran ve li dahola Zewicîyan tê lîs-

tin. Siftê du kes destpêdikin û dix-wazin bi werisan rakişînin juniyê hev. Ji destpêkê hetta dawiyê li cihê xwe nasekinin, li dora hev çerx dibin, çepràstê hev dissekinin û li hember hev diçin û tê, ji dengê daholan gumaguma şer, ji zarokan jî qîreqîra tirsê te. Mîrov bi wê xirecirê xwe li qada şer dihesibe, her yek ji wan lîstikwanan li fersendekê digerin dakkû bi hêz rakişînin juniyê hemlîstikwanê xwe. Èş, hêrs, bang, dahol, zirne, çîp, xûh, qîrîn û toz tevlihev dibin, serkeftina wî lîstikê tune, lê her kes para xwe ji êşê digre. Berî ku ew bi sedema êşê rasterast lihev bixin, pirr caran jî yekî pîr an jî yekî salpêşveçûyî dest davêje werisan û lîstikê diqedîne.

Erê, stîla brêz Nûh jî ew anî bîra min. Bi peyvan dor digere, me geh wir de dibe, geh wê de, geh dibe ser kahnîyekê, geh dibe “kundaxkirin”ê, (dibekû qun ax kirin be. r.m), geh dibe nav îxaneta jinekê û li wir ku peyv êdin har dibin, dihêjin û dikelin ew qamçîya xwe bi hêzekê ji destê xwe davêje û her kes li wî dinêhre, bêdengî dibe û di wê de stîla kek Nûh derdikeve pêş çawan û ji nişkave vîqevîqa kenekî belav dibe. Serfirazî, edebî û tîatroyî xwe bi xwendîyan dimêrîne.

Wiha bi tahm, wiha ji bihûrî û

wiha bi serfirazî.

Ne hewciye ku hema qala gîşkan bikim. Ji brêz baştir û ji wî xweşiktir nikarim jî...

Ez bi wan çirokan û bi wî zimanî, zêdetirîn bi wî zimanî, ew zimanê ku min di nav xulî, rîx, tepik, mîh, pez, çuçık, diz, hing, bax, bexçe, hebûn û tunebunê de êwisî, iro jî li ser rûpel-eka paqij û bi saya edebiyatê, bi saya brêz, rasta wî/wan hatim, bi wî an jî bi wan ve ketim govenda peyvan û me bihevre axîna dem û dewranañ kişand.

Ji çirokan zêdetir min di wir de ziman dît. Ne ku çirok ji wî zimanî bêqîmetir bûn, na. Di wir de zimanekî dinalî radibû ser xwe. Rûbarê dîrokê dipiškivî û rûyekî din dibi-riqî. Min govenda wê jîyînê kişand.

Xwes bû, bi tahm bû, têda heyatek, têda pirr heyat hebûn.

Lê zimanê me, devokê me, mîna kalekî sal bi pêşve çûyi, çav êdin li dûr û dirêjê dinêhrî, murizê xwe tahlîkirî û mînak li me sîva hatibû, ji me tiştek dixwast.

Ew xwesteka wî brêz Nuh lix-we kiribû xem. Xema edebî, xema xisletê, xema dendarê. Min di nav xema wî de stêrên edebiyata devkî ya me dît. Xweşikbûna zaravayê me dît, kurahîya wî dît.

Brêz Nuh, wê pirr jî biqêmet,

bi sebr û bi dilgermiyê dikolîne, kolandiye. Xwezî min ew ziman di zaroktiya xwe de bixwenda, xwezî ez bi wî li ber Xûdayê xwe bigerîyama, xwezî ez di navbihûsta edebiyata devkî ya xwe de bijîyama. Lê nebû, nehîştin. Heyateke me û zimanekî me hebû, ew mîna sadirekê kin ma di hûndirî me da, nerûst. Qusandin, pêşîya wî zimanî bi kutan û bi lêx-istinan girtin.

Lê iro brêz Nûh, ji “Goristana Gaviran” yekoyek keviran dikşîne “Goristana Jîyîyan”.

Iro bi wan nivîsan, bi wan çirokan, bi wan qeleman dibe ku em şabin, em nivîskarêñ wek brêz Nûh û Yusuf Polat (ku nivîsêñ wî jî pirr bedew in), neêşînin, bila ew jî hema ci di mîjiya wan de mayê/heye wê binivîsînin û bi peyv, çirok û hevokêñ wan, birînêñ me yên dîrokî başnebin jî, qet nebe, xwîna ji wan dirêje bisekinînin.

Bi “Tayek Por” qêrîna me bi awayekî din te zimêñ, qêrîn hinek kêm dibe, xwîn ji kezebê hinek kêm dirije, birîn hinek sar dibe, dibe ku giran giran qalik jî bigire...

Bi Tayek zimanê xwe ve her hebî brêz Nuh, zêde, hîn zede...

17ê Îlon 2012, malpera Galewej

Resam Nuh Ateş ile söyleşi

Füz Ateş

Kendinizi tanıtır misiniz?

—1977 yılında Konya'nın Kulu ilçesine bağlı Karacadağ Kasabasında doğdum. İlk, orta, lise öğrenimimi burda tamamladıktan sonra 2000 yılında Almanya'ya yerlestim. Evli iki çocuk babasıyım.

Resime olan ilginiz ne zaman başladı?

—Kendimi bildim bileli resim yapıyorum. Herhangi bir durum veya biri de yönlendirmemi. Varsa bu yetenek sizde başlangıcı kendinizi bildiniz bileli oluyor.

Çocukken ne olmayı düşlerdiniz?

—Fen bilgisi dersinde kitabı boş sayfaları ve içinde yer alan içi boş kutuları resimlerle doldururdum. Bu yüzden hocamdan güzel bir tokat yemiştim ama hiçbir zaman resimden vazgeçmeyi düşünmedim. Tüm kitapların boş sayfaları ve şekilleri resimlerle doldurmaya devam ettim hep.

*Resimle yaratıldığınızın
ne zaman farkına vardınız?*

—Sürekli, boş bulunduğu her an resim yapıyorum. Başlangıcını hatırlayamamak bu şekilde yaratıldığıni gösterir.

Aileniz resme olan ilginize

nasıl karşılık verdi?

—Hiçbir zaman olumsuz bir tepki almadım ailemden. Her zaman yürek-lendirildim. Çocukken çizdiğim bir resmi annem halen evin duvarında asılı tutar.

Resme geç başlasanızda resim hayatınızda

her zaman bir yere sahibti sanırı?

—Evet öyleydi. Küçükken resim yapmayı çok seviyordum. Sonra sadece kısa ve boş zamanlara yaysamda son bir kaç yıldır daha fazla zaman ayıriyorum.

Sanatinizi nasıl yoğuruyorsunuz?

—Bir atılım içerisindeyken etrafındaki karanlıkların etkisinde kalıyorum ve fantastik bir ruh haline büreniyorum. Resmin oluşma aşamasındaki o ruh halime hayal gücüm baskı yapınca içimde kaybolup gitmeyorum.

Sizi yönlendiren, bu yeteneğinizi görüp-te değerlendirmenizi tavsiye eden oldu mu?

—Daha önce bahsettiğim ve beni tokatlayan hocamın dikkatini çekince, o dönem il çapında düzenlenen resim yarışmasında okulu temsilen seçilmem de etki-

liydi. Bu daha sonra resim konusunda beni dahada cesaretlendirdi.

*Hangi tarz resim yapıyorsunuz
ve ilgi alanlarınız hakkında
ne söylemek istersiniz?*

—Ben süurrealist (gerçekdışı) resim yapıyorum. Zaman açısından biraz fakir olduğum için, boş bulunduğu zamanlarda resimle ilgili şeylerle uğraşmaya çalışıyorum.

Ne tür tepkiler alıyorsunuz?

—Ara ara yaptığım resimler konusunda hem olumlu hemde olumsuz tepkiler alıyorum. Gerçek dışı olunca resimlerimi görenlerde bir garip seme oluyor. Bunu da şuna bağılıyorum, çevremde çok fazla bu işe yakın veya içerisinde kimse yok. Ama şunu iyi biliyorum, eleştiriye açığım ve şartlar ne olursa olsun, eger çizeymişsam kendimi eksik görürüm.

Şimdiye kadar hiç resimlerinizi sergilediniz mi ve ilgi nasıldı?

Küçük bir sergi açtım. Çizdiğim resimler gerçek dışı olduğundan beklediğim ilgiyi gördüm diyemem. Gelenlerin çoğu bu işin içinden olmayan insanlardı. Bunun yanında ilgi gösterenlerde vardı. Sergiyi açar-



ken beklemek küçük bir umuttu. Azda olsa bazı kişilerin dikkatini çekti. Buda umutlanmam için yeterli oldu.

*Bîr nebûn dergisini takip ediyormusun
ve hakkında ne düşünüyorsun?*

—Bîr nebûn’u elimden geldiğince takip etmeye çalışıyorum. Avrupa’nın göbeğinde haykırdılar, „*em ji bîr nebûn*“¹. Orta Anadolu kürtleri’nin sahip oldukları en büyük değerlerden biri oldu bu güzel yayın organı ve her yeni sayısında dahada büyüyen bir değer haline geldi. Başarılarınızın devamını dileğim. We em ji bîrnakirin, em jî we bîrnakini!

Kürtlerin en eski tiyatro eseri, Ecel-i Kaza*

Sedat Ulugana –ANF

Orta Anadolu Kürtlerin'den Ebuzziya Mehmet Tevfik tarafından 1872 yılında yazılan "Ecel-i Kaza (Kaza ile Gelen Ölüm-Talihsız Ölüm)" adlı tiyatro eseri, Serhat'ın Kürt aşiretlerinden birine mensup bir haneden ailenin miri Pertev Bey'in, Kürt karşıtı Erzurum Valisi Laz Ahmet Paşa'nın kızı Nimet Hanım'a olan aşğını konu alıyor. Eser, Osmanlı devletinde Kürtlere dair ilk yerli piyes olma özelliğini taşıyor.

T.C Kültür Bakanlığı, Ebuzziya Mehmet Tevfik'i Türk yazar ve yazdıklarını da Türk eserleri olarak lance etse de, yazar bir Orta Anadolu Kürdü dür ve yazdığı Ecel-i Kaza da Kürtlerin ilk tiyatro eseri olarak bilinir.

TEVFIK'IN AİLESİ

1849 yılında İstanbul'da doğan Ebuzziya Mehmet Tevfik, Serhat kökenli Kürt Şerefli Aşiretinin Hespkêşan boyuna mensup. Hespkêşan ise Konya'nın

Cihanbeyli ilçesinin eski ismidir. Yöre Kürtleri arasında Tevfik'in ailesi Heci Hesenî olarak biliniyor. Haci Hasan'ın, 13'üncü yüzyılda Sivas beyi Ibn-i Kurd Konya'yı aldığında ailesiyle birlikte Konya'nın Koçhisar nahiyesine yerleştiği tahmin ediliyor. Takip eden yıllarda Şerefli aşiretinin bu nahiye ye göç etmesiyle birlikte nahiyenin ismi Şereflikoçhisar olarak değişir.

Ebüzziya Mehmet Tevfik, Kürtçe ve Türkçenin yanı sıra Arapça, Farsça ve Fransızca'yı da iyi derecede bilmektedir. 1866 da ülkeye meşruiyet getirmek isteyen "Yeni Osmanlılar" cemiyetine katılan Ebuzziya, 1872'de ilk eseri olan Ecel-i Kaza'yı yazar. Birkaç ay sonra da Sultan Abdülaziz tarafından Rodos'a sürgün edilir. Sürgün nedenin Ebuzziya'nın çıkarılmış olduğu "Siraç" adlı gazete olduğu görüşü edebiyat tarihçileri tarafından savunuluyor olsa da, asıl nedenin Ecel-i Kaza adlı piyesi olduğu da ifade edilmektedir.

*Kaynak: Kürtlerin en eski tiyatro eseri, *Ecel-i Kaza*

Sedat Ulugana –ANF, Mayıs 2012 Konya


İZLENEN İLK YERLİ PİYES

Ecel-i Kaza, Kürtler üzerinden Osmanlı devletine yapılabilmiş en sert eleştiridir. Eser, dönemin bazı Tanzimatçı edebiyatçıları tarafından Shakespeare'nin Romeo-Jülyet'i ile mukayese edilecek kadar ileri vurılmıştır. Eser yayınıldığı yılın Kasım ayında, ilk defa "Gedik paşa Osmanlı Tiyatrosu"nda sahnelenir. Bu özellikle de Osmanlı toplumunca seyredilen ilk yerli piyesidir. Romantik dram özelliği taşıyan Ecel-i Kaza, beş fasıl, beş perde ve yirmi üç meclisten oluşur.

KONUSU, KÜRT SORUNU!

Piyes'in ana figürü Serhat'in Kürt aşiretlerinden birine mensup bir haneden ailenin miri Pertev Bey'dir. Konusu Pertev Bey'in Erzurum valisi Laz Ahmet Paşa'nın kızı Nîmet Hanım'a olan aşkı, Erzurum Valisi'nin Kürt aşiretine karşı giriştiği katliam ve sürüp giden kan davasıdır. Bu özellikle Osmanlı devletinde Kürtlere dair ilk piyesidir.

Oyunda birbirini ölesiye seven Kürt Pertev Bey ile Nîmet Hanım'ın aileleri arasında bulunan kan davaşı yüzünden birbirilerine kavuşamamaktadırlar. Bu iki gencin arasındaki romantik aşıkın bir araç olduğu düşünülürse, Erzurum Valisi Laz Ahmet



Paşa'nın zalim bir idareci oluşu vesilesiyle özgürlük-esaret mücadeleşine yönelik bir mesaj verdiği söylenebilir.

Eserin konusu, Kurdistan'ın Serhat bölgesinin Erzurum şehrinde geçmektedir. Vaka zamanı tahminlere göre, II. Mahmut'un Kurdistan mirlerini tasfiye ettiği dönemin sonrasında denk geliyor. Hatırlanacağı üzere Osmanlı padişahı II. Mahmut merkezi otoriteyi güçlendirmek adına Kurdistan hanlarını ve mirlerini tasfiye etmiş, yerlerine valiler tayin etmiştir. Kürt aşiretleri bu tasfiye hareketine karşı direnişler sergileyip, valileri tanımamışlardır. Böylece oluşan otorite boşluğununda Kürt din adamları Kürt aşiretleri nezdinde

bağlayıcı olmuşlardır. Piyesteki örnegi Şeyh Hulusi Efendi'dir. Hulusi Efendi yeri geldiğinde Laz Ahmet Paşa'yi yerden yere vurmakta, öldürdüğü Kurtlerin şehit olduğunu belirtmektedir. Ayrıca kan davası aleyhinde fikirler içeren piyeste Osmanlı imparatorluğu bünyesindeki Kurtlerin yaşayışlarına, dini ve ahlaki inançlarına ve oylara yaklaşım tarzlarında da yer verilmiştir.

LAZ AHMET'İN KÜRT KATLİAMI

Piyesin merkezi figürü 22 yaşındaki Pertev Bey, Kurt elbiseleriyle verilmektedir, arkasında sırmalı bir kat başıbozuk esvabı, başında bir sırmalı gecelik serpuşu, belinde bir çift gümüşlü tabanca, bir hançer, boynunda bir altın kılıç, hepsinin üzerinde bir yağmurluk. Pertev üç yüz yıllık bir Kurt hanedanına mensup, ömrünün çoğu saraylarda, rahatlık içinde değil, çadırlarda, dağlarda ve zor şartlarda geçmiştir. Kurt din adamı Hulusi Efendi'den ders almış bir Serhat Kurt delikanlısıdır. Babası ve kardeşleri dâhil aynı aşiretten 40–50 Kurt, Laz Ahmet Paşa'nın emriyle Serhat dağlarının eteklerindeki bir yaylada öldürmüştür. Kurt aşireti de Laz Ahmet Paşa'nın babasını öldürmüştür.

"BÜYÜKLÜK KÜRDE
YAKIŞMAZ!"

Piyeste yer yer Kürtlüğü rencide eden "Büyüklük bir Kurt oğlundan ziyade bana yakışır" gibi diáloglar da mevcut. Laz Ahmet Paşa, Kurtlerin can düşmanıdır. Ona göre Kurtler ilkel bir topluluktur. Göçeve halleri ise cahilliklerinin ve vahşiliklerinin bir göstergesidir. Bu durumdan dolayı kızı Nimet'in Kurt Pertev Bey ile evlenmesini düşünmek bile istemez. Bunu söyle ifade etmektedir; "Hanedanının saraylarını bırakıp da Kurt çadırlarında yatacak... Utanmaz senin büyükbaban onların elinde öldü. Ben kimim? Pertev kim? Ben bugün padişahın bir veziriyim... O bir Kurt... Bir kanlı köpeğin oğlu... Bir ası... Bir haydut. Daha babamın kanı kullandığı kılıçta duruyor.. Ona vereceğime kara toprağın ne suçu var? Gebersin."

AŞİRETLERİ BİR BİRİNE DÜŞÜRME PLANI

Osmanlı sahasındaki Kurdistan'da mirlerin tasfiyesi sonrası gelişen otorate boşluğunu ve yerel yöneticilerin aşiretler üzerinde hâkimiyet kurma ve ulusallaşmalarını engelleme çabalarını da eserin satırlarında görmek mümkün; "Şimdi Soregol isyanda iken, Pertev'i öldür-

rüp de onun aşiretini de ayaklandırmak münasip değildir. Burası hudut... Devletin hudut üzerinde olan münazaralardan ne kadar ihtaraz ettiğini efendimizden öğrenmiştim... İki aşiret bir yere gelirse elbette kuvvet bulur.” Bazı yerlerde de Laz Ahmet Paşa'nın Kürt aşireti ile Kars dolaylarında yaşayan Türkmen aşireti olan Karapapakları birbirine düşürme çabaları var; “Fazıl begle Pertev'e haber göndereyim... İkna edeyim... Aşiretine yazsın... Birkaç yüz atlı istesin... Sabahleyin ben de kendisini alayım... Beraber çıkarıym... İsteyeceği atlilar Karıştıran'a ancak üç güne kadar gelebilir... Biz o vakide dek Soregol atlısıyla çarpışırız... En evvelki kavgada adam tertip ederim... Pertev'i vururlar... Sonra Soregolliler vurdur deriz... Hazır bu bahane ile aşireti hem bize isyan etmez hem Soregollinin üzerine kalıkar... Onların terbiyesinde bize bir büyük kuvvet olur.”

ESERİN VERDİĞİ MESAJ

Piyesin sonunda Nimet Hanım ölüür. Bunu gören Pertev de canına kıyar. Nimet, gece karanlığında gördüğü gölgenin babasının gölgesi olduğunu sanarak, korkudan ölüür. Nimet'in öldüğüne gören Pertev'de gümüş işlemeli tabancasıyla intihar eder.

Eserin toplumsal mesaj yönü düşünüldüğünde, figürlerin ve fikirlerin temsiliyeti konumunda Nimet, özgürlük isteyen, fakat otoritenin gölgesini bile gördüğünde korkudan ölen o günde Osmanlı toplumudur. Kürt Pertev'i ise iki konumda düşünmek mümkündür. Birincisi gerçek konumudur ki, o ası bir Kürt civanıdır. Mekâni heybetli dağ dovrularıdır. Özgür bir yaşamın delisidir. Osmanlı'nın otoritesine boyun eğmez, bunun için de fazlaıyla bedel öder. İkinci konumu “yeni Osmanlıların” şahsidir ki, yazar mensubu olduğu “yeni Osmanlılar cemiyetinin” bireylerini ası ve cesur bir Kürt delikanlığının şahsında idealize eder.

Eserdeki bu hazin son ister istemez Mem ü Zîn'i de hatırlatıyor. Ebuzziya, eserin konusuna son derece hâkimdir. Kaldı ki Soregol, Elegez, Elejgir (Eleşkirt) Kalesi gibi yer adlarına ve Kürt geleneklerine vakıftır. Kürt olması itibarıyle zorluk çekmediğini 1900lerin başında kendisi söyle diyor, “Eserin üzerinde çok çalıştım. Özellikle Kürt Pertev'in şivesi üzerinde..”


Eserde, Osmanlı'nın baskıcı rejimine karşı, özgürlüğü sembol eden Kürt Pertev beyin merkezi figür olması, Osmanlı sultanını faz-

Hazırlayan ALIM GÜR

Ebüzziya Tevfik

Ecel-i Kazâ

Incelenme, Tili ve Tercümeler Hakkında Mecmuâ - 1925



laşıyla korkutmuş olmalı ki, aynı yıl Ebüzziya'yı, Girit adasının hemen yanındaki Rodos adasına sürgün etti. Burada üç yıl zindanda yatan Ebüzziya 1876 yılında Abdülaziz'in tahttan indirilmesiyile tekrar İstanbul'a döner. Bu sırada Kürdizade Ahmet Ramiz'le tanışır. Nitekim Kürdizade Ahmet Ramiz birkaç eserini Ebüzziya Tevfik Bey'in matbaasında basar. Nihayet Ebüzziya 1900 yılında Konya'ya sürgün edilir. Meşrutiyet taraftarı bu Kürt aydını üzerinde yeterince araştırma yapılmamıştır.

Ebüzziya Mehmet Tevfik Bey

(d. 17 Şubat 1849, İstanbul - ö. 27 Ocak 1913)

Gazeteci, yazar, yayıncı, hattat.

Türkiye'de "matbaacılığı sanat hâline getiren kişi" olarak kabul edilir. O zamana kadar süreğelen ve halk dilinde "Acem baskısı" denilen kirli ve kötü baskından Türk basımcılığını kurtaran ünlü matbaacı; yaşadığı dönemin önemli sanat ve düşün adamlarına ait yüzlerce yapıtı sanat değeri yüksek tasarımlarla basmıştır. [1].

Yeni Osmanlılar adlı aydın hareketinin aktif bir üyesiydi, sürekli muhalif bir aydın olarak daha çok siyasi kimliği ile tanındı.

Kufi türünde dikkate değer eserler vermiş bir hattat, arabesk tarzında yetkin süslemeler yapan bir süslemeci, Konya'da bulunduğu dönemde sanat eseri niteliğinde halîlî dokumu bir halıcı idi.

Kitapları:

Ecel-i Kazâ (tiyatro)

Numune-i Edebiyyat-i Osmaniyye (antoloji)

Yeni Osmanlılar Taribi (Tarihi, biyografik)

Lugat-i Ebuzziya (sözlük/tek cilt)

Hat Eserleri:

İstanbul Kızıltoprak takı Zühtüpaşa Camii'nin kûfi hatla yazılan *kuşak* yazısı Ebüzziya'nın eserleri arasındadır. İstanbul'da Yıldız Sarayı yolu üzerindeki Yıldız Hamidiye Camii 'nin kubbesinde Kûfi hatla, mavi renk üzerine altınla yazılan "Mülk Sûresi" Ebüzziya Tevfik'in eseridir.



Rûdaw

Rojnameya Kurdên Ewropayê

Ligel ku hêjî xwendina rojnameyê kurdî bi gellek Kurdan giran tê, lê dîsa jî di van nêzîkî 3 salêن weşana rojnameya Rûdawê de, ku tena rojnameya xwerû bi kurdî ye li Ewropayê, Rûdawê kariye hejmareke baş ya xwendevanan ji xwe re peyda bike. Ev pêşwazî û eleqeya baş ji bo rojnameya Rûdawê nîşan dide ku potansiyel û hejmarek baş ya xwendevanêن bi zimanê kurdî jî peyda bûye û her ku diçe, ev hejmar zêde dibe. Herwiha ev yek nîşan dide ku bi qalîteyek û naverokeke baş rojnameyê zimanê kurdî jî dikarin xwendevanan ji xwe re peyda bikin.

Rûdaw heftane, her rojêن pêncsemê tê weşandin û navenda çapa Ewropayê ya Rûdawê li bajarê Almanya Kölnê ye. Ji bili çapa Ewropayê, ku bi herdu zaravayêن kurdî, kurmanciya bakur û kurmanciya navîn (sorani), tê weşandin, Rûdaw li Başûrê Kurdistanê jî tê weşandin û li Başûrê Kurdistanê yek ji belavtirîn û bibandortirîn rojnameyê herêmê ye.

Ji destpêka weşana Rûdawê, çend prensip û stûnêن bingehîn yêن weşa-

na Rûdawê ev in: netewî-kurdistanî, pirrengî, bêalibûn, rexnegirî, objektîv, û informatîv. Bi torek ji bi dehan hevkaran li hemû beşen Kurdistanê û gellek welatêن ku Kurd lê dijîn, bi taybetî li Ewropayê, Rûdaw her heftiyê hewl dide ku bi babetên balkêş û giring berhemeye dewle-mend pêşkeşî xwendevanêن xwe bike.

Rûdaw niha, bi giranî li Almanyayê, li çendîn welatêن Ewropayê, weke Brítanya, Belçika, Swîsre, Awisturya, Norwêc û Danîmarkê tê belavkirin û li zêdeyî 1000 rojnamefroşen Ewropayê tê firotin. Wekî din jî Rûdaw bi réya abonetiya rojnamê xwe digihîne xwendevanêن kurd. Bihayê abonetiya Rûdawê ya salekê (52 hejmar) 60 Euro ye. Ji bo naskirina Rûdawê, xwendevan dikarin ji bo 4 heftiyân Rûdawê belaş ji navenda rojnamê li Kölnê bixwazin.

Ji bo pêwendiya ligel Rûdawê:

E-mail: info@rudaw.eu

Tel: 0049-(0) 221 - 26 00 4002

www.rudaw.eu / www.rudaw.net



Mîma Awê ji gundê Bêşkardaşê, dor salên 1940